Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1158 | 7-Nîsan-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Eşqa kurdan di çiyayan de hatiye parastin



Hunermend Berbang Hilat ku ji bo Newrozê hatibû Şengalê dema li Geliyê Kersê dest bi strana Delala Qerejdaxê dike, ji Qerejdaxê heya Şengalê hemû deşt û çiyayên Kurdistanê dibin yek û bi strana xwe vê peyamê dide me: "Eşqa Kurdan di van çiyayan de hatiye parastin û pêwîst e em li van çiyayên xwe xwedî derkevin."

Dema qala Kurdistanê tê kirin, welatekî ku xençereke zeng girtî li dilê wî ketiye û bûye çar parçe dikeve bîra mirov. Ev erdnigariya ku dergûşa mirovahiyê ye ji aliyê dijmin ve hatiye parçekirin. Êşa parçebûn û dagirkirina welatê şêrîn bûye helbest û stran di dil û dengê hozan, dengbêj û helbestvanan de. Şair û dengbêjên wî welatê tenya, di dilê xwe de welatê xwe kirine yek, hozan û hunermendên şoreşger ji bo vî welatî hem karê hunerê kirine hem jî şer kirine. Di çîrok, helbest û stranên ku li deşt, zozan, çiya û geliyên Kurdistanê hatine hûnandin de çar parçeyî tenê gotinek e, eşq û evîniya welat ti carî parçe nebûye û herdem di dilê vî gelî de geş bûye. Şengal ku kulîlka herî xweşik a baxçeyê Kurdistanê ye, ji gelek stran û destanên Kurdî re bûye çavkanî. Bi saya van stran û destanan, kesên ku çav bi Şengalê neketine jî, bi hêjîr, titûn û xezalên Şengalê hesiyaye.

Hunermend Berbang Hilat ku bi strana xwe ya bi navê Delala Qerejdaxê tê naskirin, bi vê çîroka evîndariyê tevahiya sînoran ji navbera çar parçeyan rakiriye û di vê stranê de ew peyam daye keç û xortên Kurdistanê ku bi tenê li welatekî azad dikarin bibin xwediyê evîneke serkeftî û bi wat e.

### Delala Qerejdaxê û eşqa welat

Berbang Hilat ku di strana Delala Qerejdaxê de behsa derdora Çiyayê Qerejdaxê dike ji bo pîrozbahiya Newrozê vê carê berê xwe da Çiyayê Şengalê. Dema Berbang Hilat li Deriyê Kersê ya Şengalê dest bi gotina strana xwe dike, ji Qerejdaxê heya Şengalê hemû çiyayên Kurdistanê dibin yek. Dema li cihekî mîna Geliyê Kersê bi dengê Hozan Berbang mirov peyvên kûrên vê stranê guhdar bike, eşqa mirov a ji bo xweşikî û bedewiya Kurdistanê hê zêdetir dibe.

### 'Eşqa Kurdan di çiyayan de hatiye parastin'

Hozan Berbang piştî vê strana destanî ji me re dibêje, dest bi çîroka stranê dike û dibêje: "Eşqa Kurdan di van çiyayan de hatiye parastin û pêwîste em li van çiyayên xwe xwedî derkevin. Di vê stranê de behsa hejîrên Çiyayê Şengalê jî tê kirin, ji ber ku di çanda me de giringî bi nivîsandinê nehatiye dayîn, herdem behsa xwezaya Kurdistanê hatiye kirin û ev stran wiha ji me re mane. Lê nihe di gelek stranan de mirov vê xwezaya bedew nabîne, ji ber ku dijmin xwezaya Kurdistanê jî xirakiriye."

### 'Stranên me çand û dîroka me dihewîne'

Berbang di strana Delala Qerejdaxê de behsa hejîrên Şengalê, dimsa Tiziyanê li herêma Mêrdînê û tiriyê Amedê dike û sedema vê wiha şîrove dike: "Stranên me evîn, dîrok, çand, xweza û wêjeya Kurdî hemûyan di nava xwe de dihewîne. Pêwîst e her Kurd li çand, dîrok û xwezaya Kurdistanê xwedî derkeve. Li herêma Rihayê evîniyek diqewime, wekî çîroka Salih û Nûrê û Derwêşê Evdî ev jî çîroka evîneke dîrokî ye lê zêde nehatiya lêkolînkirin. Mixabin gelek destan û stranên me nehatîne lêkolînkirin û winda bûne. Ev jî ji ber şerê dijmin ê li hemberî me ye û dijmin xwestiye bi talankirina xwezaya Kurdistanê hemû dîroka Kurdan jinav bibe, dijmin bi vê yekê re jî sînordar nemaye, heya xwestiye xwîna Kurdan jî biguhere. Lê niha ew derfet heye ku em li çand, stran û xwezaya xwe xwedî derkevin."

Berbang Hilat di dawiya axaftina xwe de jî bi van gotinan bang li civaka Êzidî dike da ku xwedî li çanda xwe derkevin: "Şengal wekî beşek ji Kurdistanê bê xwedî mabû, ti kes li vê dîrokê xwedî derneket. Lê niha gelê me yê Şengalê û civaka me ya Êzidî pêwîst e li van nirxên xwe yên dîrokî xwedî derkeve."

# Şelaleya Ava Spî ji ber ciwaniya xwe bûye cihê geştiyariyê

Ji ber ciwanî û balkêşiyê Şelaleya Ava Spî ya li Balekayetî bûye ciheke giring yê geştiyaran. Rojane gelek welatî û geştiyar ji bo dîtina şelaleyê û derbaskirina demek xweş serdana wê dikin. Lê geştiyar ji ber xirabiya rê û nebûna xizmetguzariyan bi gazindin.



Şelaleya Ava Spî ya li gundê Çumbilok a ser bi bajaroka Simêlan ya devera Balekayetî ji ber ciwanî û ava xwe bûye yek ji cihên geştiyariyê. Rojane geştiyar û welatiyên deverê ji bo derbaskirina demek xweş û girtina wêne û dîmenên xwe serdana şelaleyê dikin.

Serdar Hisên yek ji wan geştiyaraye ku ji bo dîtina şelaleyê serdana deverê kiriye. Serdar got: "Şelaleya Ava Spî li Balekayetî dîmenek xwe yê ciwan û balkêş heye. Ji ber vê taybetmendiya wê gelek geştiyar serdana wê dikin û li ber şelaleyê wêne û dîmenên xwe digrin."

Di dewamê de Serdar Hisên îşaret bi parastina jîngeha deverê jî kir û got: "Daxwazê ji geştiyarên ku serdana vî cihî dikin, xwezayê paqij bigrin daku dîmenê ciwan yê şelaleyê têk neçe. Her wiha daxwazê ji hikûmet û aliyên peywendîdar dikin xizmetguzariyan ji deverê re bikin û rêya hatina şelaleyê çêkin daku geştiyar bi rehetî bikarin hatûçonê bikin."

Wênegirê bi navê Senger Selahî jî li ser ciwaniya şelaleyê got: "Şelaleya Ava Spî dîmenek xwe yê ciwan û balkêş heye. Ji ber vê yekê jî salane bi taybetî jî di demsala Biharê de welatî û geştiyar serdana wê dikin û demek xweş li ber şelaleyê derbas dikin. Her wiha wênegirên deverê û cihên din ji bo girtina wêneyan serdana şelaleyê dikin."

Senger Selahî diyarkir ku ava şelaleyê ji bilindahiyek zêde de tê xwarê û di nava kevir û newalan de tê xwarê, vê yekê jî ciwaniyek cûda daye deverê.

### Sudoku: Bersiv 70

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 7 | 8 | 1 | 2 | 9 | 5 | 6 | 3 | 4 |
| 2 | 9 | 3 | 1 | 4 | 6 | 5 | 7 | 8 |
| 4 | 6 | 5 | 3 | 7 | 8 | 9 | 2 | 1 |
| 5 | 1 | 9 | 8 | 2 | 7 | 3 | 4 | 6 |
| 6 | 2 | 4 | 5 | 1 | 3 | 7 | 8 | 9 |
| 8 | 3 | 7 | 4 | 6 | 9 | 1 | 5 | 2 |
| 3 | 5 | 2 | 6 | 8 | 1 | 4 | 9 | 7 |
| 9 | 4 | 6 | 7 | 5 | 2 | 8 | 1 | 3 |
| 1 | 7 | 8 | 9 | 3 | 4 | 2 | 6 | 5 |

### Sudoku:Pirs 71

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | 1 | | | 3 | | 7 | |
| 3 | | 5 | | | 2 | 1 | | |
| | | 4 | | 5 | | | | |
| 7 | | | 4 | 2 | | | 9 | |
| | | 2 | 8 | | 6 | 7 | | |
| | 8 | | | 3 | 7 | | | 1 |
| | | | | 8 | | 2 | | |
| | | 8 | 2 | | | 4 | | 7 |
| | 9 | | 7 | | | 5 | | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Rojê heft xesûyan dixeniqîne, bi şev ji qurquroneka dêrî ditirse:**
- Sêhrekiyan dike; derewan dike; bi zanebûn xwe wisa nîşan dide; metrebaz e.

**Rûyê reş û spî wê ji hev kifş bibin:**
- Ka kî derewan dike, kî rast dibêje wê diyar bibe.

**Serê wî bi ard ji aş bê, ti kes jê bawer nake:**
- Ne yê baweriyê ye; baweriya ti kesî pê nayê; pir derewan dike.

**Stirhên derewînan şîn nabin:**
- Derewên te pir eşkere ne; derewên te pir mezin in; tu pir derewan dikî.

**Şahidê mino dûvikê mino:**
- Şahidê wî amade ye; şahidê wî pê re ye; çi dibêje hevalê wî erê dike.

**Şape bi ser hev de berdan:**
- Derewên pir mezin kirin.

**Şaqolê wî şkest:**
- Derewa wî derket hole.

**Şaqolê wî xwar bû:**
- Bi heman wateyê.

**Tûrikê derewînan qul e:**
- Derew zû eşkere dibin.

**Xirê xwe bi paçikan mezin dike:**
- Bi derewan pesnê mêraniya xwe dide.

**Xwe berda:**
- Dest bi derewan kir.

**Xwedê heye:**
- Mirov derewan bike nebaş e; divê mirov li paş hina rast biaxive.

**Yekê heft xesû xeniqandibûn ji biqebiqa devê cêr ditirsiya:**
- Sêhrekiyan dike; derewan dike; bi zanebûn xwe wisa nîşan dide; metrebaz e.

**LI SER KAR, XWESTEK YAN JÎ GOTINÊN BÊWATE Û NE DI CÎ DE**

**Bav ji êş tê kur pirsa bajêr jê dike:**
- Tiştên bêwate dibêje; hişê wî li devereke din e; nizane ka çi dibêje.

**Bav ji êş tê, kur qisetan dike:**
- Dema haya yekî ji bûyerekê, tiştekê hebe, lê yê ku baş nizane behsê dike, hingê jê re tê gotin.

**Bûye çiraya ber koran:**
- Karekî bêwate ye; karekî pûç e; ti faydeya wê nemaye.

**Bûye defa ber keran:**
- Bi heman wateyê.

**Cê berdin ser cê, gênim berdin ser gênim:**
- Dema mirovek bi kêrî tiştekî neyê, lê berpirs be û sirf gotinên berpirsên ser xwe re pêk bîne, hingê tê gotin.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Bi kurtî jıyana Rêber Abdullah Ocalan...(2)

Rêber Apo di 9'ê Cotmeha 1998'an de bi balafirê ji Sûriyê derket û şeva heman rojê çû paytexta Yewnanîstanê Atînayê. Lê belê, ruxmî ku li ser navê rêveberiya Yewnanîstanê hatibû vexwendin jî ji aliyê Şefê Îstixbaratê yê Yewnanîstanê ve têketina wî ya Yewnanîstanê hat astengkirin.**R-4**

## '4`ê Nîsanê rojbûna gelê kurd e'




Endamên Meclisa Malbatên Şehîdan, hunermend û rewşenbîrên bajarê Qamişlo 4'ê Nîsanê Rojbûna Rêberê Abdullah Ocalan li tevahiya gelên azadîxwaz pîroz kir û gotin, "Rojbûna Rêber Apo ji bo gelê kurd û tevahiya gelên azadîxwaz yên cîhanê, rojbûna azadî, demokrasî û wekheviyê ye."R-6

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1158 | 7-Nîsan-2024 | www.ronahi.net/ku/

# QONAXA NÛ YA ÇALKIYA GIRTIYÊN AZADIYÊ MISOGERIYA AZADIYA RÊBER APO YE

Çalakiya girtiyên azadiyê ya li girtîgehên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê ku bi daxwaza azadiya Rêber Abdullah Ocalan û çareserkirina pirsgirêka kurd di 27'ê Mijdara 2023'yan de bi greva birçîbûnê ya bêdem û dorveger hatibû destpêkirin, di 4'ê Nîsana 2024'an derbasî qonaxeke nû bû. Di qonaxa nû de çalakî bi boykotkirina hevdîtinên ser telefonê, malbatan û dadgehê didome.**R-5**




## Li hemberî êrişên dagirkeriyê hêza têkoşînê mezintir dibe

Êrîşên dagirkeriya Tirk yên li dijî herêmên Efrîn û Şehbayê bi giranî dewam dikin, di meha Adarê de ciwanek şehîd bû û yek jî birîndar bû. Koçberên Efrînê yên li Til Rifetê li hemberî êrîşên dagirkeriyê sekna gel destnîşan kirin û gotin, "Faşîzma Tirkiyê bi topbaranên rojane wê nikaribe îradeya me ya mayînê têk bibe."**R-3**



## Rola jinê di pêşxistina Pergala Netewa Demokratîk de



Di avakirina Netewa Demokratîk de, rola sereke dikeve ser milê jinan. Asta azadbûna jinê ya ku bandora xwe li demokratîkbûyînê bike jî, wê bibe bingehek xurt, mayînde û kûr ji bo azadiya civakî.**R-2**

## Wêjeya zarokan




Helbestvan, çîroknivîs û nivîskarê lîstikên şanoyê bi zimanê kurdî Alan Ebdullah ê ji Qamişlo ye, wek tevahî gelê xwe Alan ji nivîsandina bi zimanê xwe li ser çand û dîroka xwe bêpar mabû. Ji ber tunebûna nivîskarên helbest û çîrokên zarokan li herêmê, wî berê xwe da vê qadê.**R-7**


Ahmed Aktaş
Di hilbijartinan de serkeftina gelê Kurdistanê pîroz be! R-4


Hafiz Ahmet Turhallî
Cejn û misilman R-6


Sîpan Şînda
Bûyîn Hemwelat û Hesta Hemwelatîyê R-7

# Rola jinê di pêşxistina Pergala Netewa Demokratîk de

Di avakirina Netewa Demokratîk de, rola sereke dikeve ser milê jinan. Asta azadbûna jinê ya ku bandora xwe li demokratîkbûyînê bike jî, wê bibe bingehek xûrt, mayînde û kûr ji bo azadiya civakî.

**Berçem Silêman/Qamişlo**

Pêvajoya avakirina Netewa Demokratîk, di demên şer de hîn zêdetir bi zehmet û ji her pêvajoyekê zêdetir pêdivî bi kedê heye. Ji ber ku pergala demokratîk û dewletê wê zik hev de bin, dewlet wê vê pergalê ji bo xwe her dem wek faktoreke gef xwarinê bibîne, ji bo wê jî vê serî li rêbazên dewisandin, paşde xistin, berovajî kirin û rizandinê bide. Di vê wateyê de, ji bo ku jin bikaribin di xebatên neteweya demokratîk de pêşengiyê bikin, pêwîste di her alî de, bi berfirehî û kûrahî xwe birêxistin bikin ku ev yek hem ji bo pêşeroja jinan û hem jî ji bo pêşeroja civakê pir girîng e. Pejirandina jiyana demokratîk, Rêveberiya demokratîk, zîhniyeta têkiliyên demokratîk di nav jinan de, yek ji tişta herî serekeye û nabe dest jê bê berdan. Pêwîste bê zanîn ku qalibên tevger û zîhniyeta koledar bi giştî jî kapîtalîzmê ji bo jinê rewa dibînin, ev yek astengiyên herî sereke yên li pêşiya demokratîk kirinê ne. Ji bo demokrasî û azadiyê, bi qasî ku pêdivî ji holê rakirina serdestiyê heye, pêdivî bi derbas kirina kesayetên kole jî heye. Pêwîste jin xwe bigihîne qadek berfireh a rêxistinî, ku ji aliyê siyasî, çandî, civakî, aborî, xwe parastinê û li ser vê bingehê ji civakê re pêşengtiyê bike.

**Pergal herî zêde malbatê dike hedef**

Xebatên birêxistin kirinê yên jinan li her çar parçeyên Kurdistanê û hewldanên zîndî ya yekîtiya netewî a ji hêla ruhî û pratîk de, nêzikatiyên kolektîf yên bi jinên herêm û cîhanê hêlişt ku rewşa tevlîbûnek çalak a di qada civakî de çêbibe. Yek ji xebatên herî girîng a polîtîkbûn an jî azadbûnê ye. pêwîste jin, polîtîkbûnê ji rastiya dewlet cûda bikin, li ser bingehê azadiya zayendî, nêzikatiyek hevseng a nirxên gerdonî û netewî hertim xwedî derbikeve û pêş bixe, ev yek jî rê li ber qadên jiyana azad vedike. Qada civakî a neteweya demokratîk yek ji wan qadane ku pêwîste herî zêde nirxên madî û manewî yên jinan bi awayek herî bihêz tê de bê raber kirin. Her wiha yek ji wan qadane ku herî zêde dibin rûxandina pergalê de maye. Ev dewletên ku bi saziyên zilamê serdest li ser lingan dimîne û di heman demê de feraseta ku derveyê vê jiyanê, jiyana hilbijartinê nîne li ser jinan ferz dike. Heta ku tevahiya civakê nas bike ku jiyana hilbijartinê heye, pêwîste di qadên xweser an jî taybet yên jinan de çareserî bên nîşandayîn, tevlîbûn ji qadên civakî hîn zêdetir bibe û girîng e ku desthilatdarên ku sînorên teng yên mirov kûr dike, nemînin. pêwîste pîvana bingehîn azadîxwazî, wekhevî, polîtîkbûn, exlaqî û civakî be.

Di pergala kapîtalîst de jiyana civakî tenê bi malbatê re nayê sînordar kirin. Têgeha neteweperest, zayendperest, olperest û desthilatdar di tevahiya saziyên dewletê de li ser kar e, jin û civak tê perçe kirin, dijminahî di navbera wan de tê belav kirin, ji hêzê tên xistin. Raman, ziman, tevger û piskolojiya wê tê birêve birin. Civakên nexweş û ne saxlem tên avakirin. Rastiya netew-dewletê ne tenê pêkanînên xwe yên bişavtinê di ziman û çand de dide jiyan kirin. Kesî neçar dike ku heman xwarinê bixwe, eynî tiştan vexwe, heman cilan li xwe bike, heman şêweyê têkiliyan bijî, qiyasa bedenê wan wek hev be, xwedî heman tevger û nizikatiyan be, bi heman terzî bikene-bigirî. Ji bo vê jî hebûna jinên Kurd a li çiyayên azad xwedî girîngiyek mezin e. Ligor van derfetan, derxistina holê a nasnameya jina azad pir girîng e.



**Têkiliyên hevjiyana azad**

Ji bo ku jin derbarê jiyana xwe de xwedî gotin bin, pêwîste berî her tiştî bi hêz bin. Ji bo têkiliya ku bi civak, xweza, zilam re dideynin, li ser bingehê bi xwe bawer bûn û seknek saxlem be, bihêz bûn pêwîste. Hêza jinê ji birêxistinbûna wê a şexsî û kolektîf tê. Têkiliya hevjiyana azad a ku Rêber Apo daye diyar kirin, xwe dispêre ´xwebûn´a jinê, demokratîkbûna zilam û rastiya civakîbûnê. Hevjiyana azad, formeke pirr girîng a li dijî zincîrên koledariyê yên berî pênc hezar salî ye. Pergala koledar çiqas di hiş û mêjiyê me de hatibe rûniştandin û çiqas civaka me hatibe bela kirin, avakirina hevjiyana azad ewqas jî kedê dixwaze. Dema ku em di nav pirsgirêkên civakî yên heyî de, wek girêyek kûr lê hatiye dijîn. Lêgera sekna hevjiyana azad, egera nasnameya jina azad be, ne pêkan e dest jê bê berdan.

**Yek ji pêdiviya jinan jî xwe parastin e**

Civaka ku nikare xwe biparêze, wê her dem bi tehlûkeya dagirkerî û mêtîngehiyê re rû bi rû bimîne. Jinên Kurd di vê mijarê de xwedî tecrubeyên mezin in. Girêdayî vê yekê, li bajar, gund û taxan pêşxistina birêxistinbûnên jinan a ji hêla parastinê de yek ji pêdiviyên herî bingehîn e. Di van rojên ku em tê de dijîn, qirkirina jinê, tundî û destavêtin wek bûyerên rojane lê hatine, ji ber vê yekê girîngiya hêzên parastinê her roj zêdetir derdikeve pêş. Di heman demê de, di nav yekîneyên parastina gel de jî ji bo parastina civakê pêwîste hîn zêdetir hêza jinê cihê xwe tede bigire. Li Rojava hêza fermandar û şervanên jin yên di nav YPJ û YPG´ê de û asta wan a têkoşînê, mînaka herê ber bi çav ya rê li berpirsyariya jinê a ku xwe û civakê biparêze derxistiye holê.

Avakirina Neteweya Demokratîk evîn û azweriyek mezin dixwaze. Herwiha jin û gel li hemberî hêzên desthilatdar tu caran evqas bi hêz nebûne, nirxên xwe yên madî û manewî tu caran evqasî bi hêz amade nekiribûn, lê pergala şaristaniyê jî di tu demê de wiha pûç nebibû. Jin divê bi hêza xwe ya birêxistinbûyîna pratîk, hizrandin û hest, ji avakirina Neteweya Demokratîk re pêşengiyê bike û bi vê yekê re rola xwe ya dîrokî bileyze, li ser vê bingehê jî ji keda şehîdan re bi xwedî derketina ji jiyana azad re erk û berpirsyariyên xwe bi cih bîne.

# Şoreşa me Şoreşa Zarokaye

**Mahsûm Bagok**

12 Adarê li Qamişlo, 16 Adarê li Helepçe, meha Tebaxê li Şengalê û 13 Adarê li Cindêrêsa Efrînê qetilkirina zarokan çavkaniya xwe ji heman hişmendiyê digire. Li bajarokê Cindêrêsê qetilkirina zarokê bi navê Ahmed Mamo bi vî rengîye. Dagirekeran li Kurdistanê, çetêyên faşîst û paşverû kuştina zarokan,ciwan,pîr û kalên me ji mafê xwe dibînin. Qetilkirina zarokên Kurdistanê bi sed hezaran tê kirin. Berî vê jî heye, lê belê di sedsala 21.de divê cîhana me de zihnîyet û hestên ewqasî derveyî mirovahîyê pêşneketine ku ji bo berjewendîyên xwe ji bo bikara zêde, kuştin û talankeran çavên xwe digirin. Xwe bê deng dikin û nabihîzin. Xwedîyê zihnîyeta desthiladar, dengê xwe ji hevre nakin. Ya girîng çîye? Berjewendîyên wan yên madîne. Xwedayên van û dîne van bûne pere. Ji rê derketinek mezin heye. Êrîş,talan, koçberkirin,guhertina demografîk,qirkirin û dagirkirina herêma Efrînê, li ber çavên her kesan û her hêzan çêbû. Bi dehhezaran û sedhezaran biçûk û mezinên Efrînê ji ser axa xwe koçber bûn. Divê neyê jibîrkirin ku li herêma Efrînê berxwedanek dîrokî pêk hat. Di vî şerî de bi sedan şehîd û brîndar çêbûn. Ew Kurdên ku li Efrînê mane, her roj rû bi rûyê êrîş, talan û qirkirina çandî û fîzîkî tên.




Yek jî wan zarokê xweşik Ahmed Mamo ye. Ev buyer weke ku yek şexsî pêkanîye tê dîtin. Ew di encama hişmendiya qirkirina zarokên Kurdane. Li herêma Efrînê dewleta Tirk bi tevahî hêzên xwe yên şerê taybet vê herêmê birêve dibe ji ber çeteyên li wir jî xwedî heman hişmendî û pratîkên. Bi kuştina her zarokekî/ê pêşeroja zarokan tê tarî kirin. Her wiha li kû devera cîhanê dema ku zarok ji milê çandî û fîzîkî ve bêne kuştin, pêwîste em li hemberî vê yekê xwedî helwest bin. Zarok ronahiya siberoja gel û welatin. Şoreşa Kurdistanê ji bo xatirê zarokan e. Ji bo zarokên welatê me di nav aramîyê da, bê tirs jîyan bikin şoreş çêdibe. Zarokê xweşik Ahmed Mamo yê Efrînî zarokê welate û ev birayê her Kurdekî/ê ye. Li Cindirêsa Efrînê kurdên çîyê û deşta Comê li zarokê xweşik xwedî derketin. Helwesta wan bi nirxe û pir hêja û dîrokî ye. Ev mînak çirûskên pêşeroja azadin. Li deverên cuda, li welat û derveyî welat jî xwedî derketin û bertek pêş ketin. Lê belê pir lewaz û kêm bû. Wiha nabe. Pêwîste her Kurdek kêmanîya xwe bibîne. Bi rexne û rexnedayîn nêz bibe.

Dubare û sedbare em bêjin; di rojên pêş de û li kîjan devera Kurdistanê êrîş û qirkirin li ser zarokekî/ê çêbibe her kes pêwîste ku bi rengekî hesas û baldar nêzîk bibe û di heman demê de bersivê bide. Cîran ji cîranê xwe re bêje. Teknîk jî pêş ketîye. Bi rêya medyaya civakî xwe rêxistin bikin, bi lezgînî hevdû agahdar bikin. Civak weke lehîya avê an jî weke herikîna çemê Firat, Dîcle, Aras,Munzur,Avrîn,Sîrwan û Zapê biherikin kolan û meydanan. Da kû rojeveke Kurdan û navnetewî ava bikin. Her wiha tevahî beşên ragihandina şoreşê rojev li ser rojevê pêş bixwînin. Ked û asta ragihandinê pir û pir hêja û girînge.

Di asta yekemîn de dewleta tirk gunehbar û sucdar e. Çeteyên faşîst li gorî wan tevdigerin.

Di şexsê zarokê xweşik Ahmed mamo de tevahî zarokên li Efrîn û Kurdistanê têne tehdîd kirin û kuştin. Roja ku Efrîn hatiye dagirkirin roj nîne ku, zarok ciwan, jin, pîr û kal fîzîkî An jî çandî neyên kuştin nîn e. Her roj ev kuştin berdewamin.

Kurdistanî divê kû pir şîyar tevbigerin. Li ser kuştina zarokên Kurdan gelekî hassas bin û baldarbin. Li kî devera welat êrîş li ser zarokên Kurd çêbibe, pêwîste helwesta Kurdan li welat û derveyî welat hebe û rabin serhildanê. Divê neyê jibîrkirin ku qetilkirina yek zarokekî/ê qetilkirina tevahî zarokên Kurdistanê ye. Dema yek zarok hate kuştin, divê Kurd qiyametê rakin. Helwesta sedhezaran û milyonan pêşkeve. Da ku dijminê Kurdan hezar caran poşman bibin. Helwest û bertekên cîdî çênebin, wê kuştina zarokan zêde bibe. Îro zarokê xweşik Ahmed Mamo bû. Sibe wê hejmar bibe bi dehan, sedan û hezaran.

Her roj li Kurdistanê bi milyona zarokên welatê me rû bi rûyê qirkirina çandî tê. Li ser zarokan siyaseta helandin (asîmîlasyon) pêktê. Ev jî kuştina fizîkî ne kêmtire û xeternake. Zarok paqijin. Ew baş nizanin xwe biparêzin. Parastina zarok û civakê erkê ciwanan e, pêwîste ciwan pêk bînîn. Her wiha wê dayîk û bavê van pêkbînin. Herî girîng jî wê tevahî civak-netew li zarokan xwedî derkevin û biparêzin. Îro li Rojava- Bakur û Rojhilatê Surîyê da mamoste jî dikarin risteke girîng û dîrokî pêkbînin.

Dîplomasî jî dikare bi plansazî binirxîne. Dijmin teşhîr bike. Alîyên eleqedar serwext bike. Şaxên vê xebatê jî gelekin. Bi kurt û kurmancî, tevahî beşên pergala xweserîya demokratîk bi biryar û çalakvan bin. Bi ruhê seferberîyê em li zarokên xweşik û pêşerojê xwedî derkevin û biparêzin. Ev erkên mirovî û netewîne.



# Rola jinê di wêjeyê de

Wêje hunereke bi pêşveçûna xwezaya mirovahiyê re pêşketiye, hunereke ku mirovahiyê xwe pê îfade kiriye û bi rêka wê jiyana xwe bedewtir kiriye. Wekî tevahiya qadan, di qada wêjeyê de jî jin xwedî roleke sereke bû û mohra xwe li tevahiya qonaxên pêşketina wêjeyê xistiye.

**Navenda nûçeyan**

Rola jinê di edebiyatê de bi qasî ya di jiyanê û pênasekirina wê de ye. Di pêngavên civakî yên destpêkê de û heta niha jî rola jinê çawa di pêşketin û komkirinên nirxên civakî de çiqasî bêhampa be, di edebiyat û pêşdebirina wê de jî heman e. Bê edebiyatê Tu pêşketinên jiyana civakî çênebûne. Lê belê heke em di roja îro de tenê tiştên nivîskî bigirin dest. Wê demê dîroka berxwedan û têkoşîna mîrovahiyê çawa ji bo pêşdebirina jiyanê û parastina nirxên mirovahiyê timî têkoşiyane, jinê jî timî cihê xwe di nav de di rola pêşengtiyê de girtiye. Lewre rola jinê di edebiyatê de di asta berpirsiyartiya parastin û bedewkirina jiyanê de ye.

**Dayîk hêza manewiyata civakê û kombûna wê ye**

Dema em BZ bi hezarê salan jî bigirin dest, em ê gelek destanên wê demê yên ku bi zimanê jinê jî hatine gotin bibînin. Zanîna jinê di wan destanan de jî diyar e. Heke em beriya vê jî bigirin dest em ê bibînin ku dayîk bi xwe hêza manewiyata civakê û kombûna wê ye. Lewre lorîkên ku dayîk ji zarokên xwe re dihûne jî hemû wêjeyî ne û ji xwezayê qet qutnab. Herwiha di Şahî û şînan de jî mirov timî dibîne ku jin zêdetir wê pênase dike û xwediya wê hêzê ye ku karibe di buyerekê de serdemekî jî pênase bike. Lewre gelek tişt bi deng û hestên jinê hatine hunandin û ev dide diyarkirin ka jin çiqasî dikare jiyanê bi kêfxweşî, xemgînî û bedewiya wê îfade bike.

Edebiyata manewî mirovahî jiyana xwe ya civakî pê mayende kiriye. Ji ber girêdayî cîhana mirovan, xeyal, raman û hêviyê ye. Jinê bi hestên xwe yên tenik kariye bi vegotineke bedew wê ji civakê re ragihîne. Heke em bêjin mirov ji derya hizir û xeyalê xwe tenê dilopna dadiwervîne li ser cîhana derveyî û xwe pê îfade dike, lê ya asoyê mirovan ber bibedewiyeke bedewtir ve dibe cîhana mirovan ya xeyalî. Têkiliya edebiyatê bi hemû pêşketinên mirovan re heye û mayendekirina wan re di nava hev de hatiye hunandin.



Têkiliya jinê bi edebiyatê re dema em şîrove bikin, wê demê em ê mijara berdewamiya rola jinê ya civakî ji dema berê heya niha em ê bigirin dest. Bi destpêkirina jiyana civakî ve, jinê bi riya rola xwe ya vegotinên edebiyatê re, bûye hozaneke ku karibe derdora xwe kom bike. Hertim jinê bedewiya jiyanê bi zimanekî edebiyatê teswîr kiriye û ji nifşekî gihandiye nifşekî din. Zimanê jinê yê jiyanê bi edebiyata devikî çalakiya jiyanê îfade dike û mayende kirina wê dide diyar kirin. Ji ber ku di jiyanê de bingehê civakîbûnê temsîl dike, tê wê wateyê bi edebiyateke bedew xwe îfade kiriye. Da ku jiyaneke bedew û bi estetîkên barkirî were berdewam kirin, hertim jinê rengê xwe nîşandaye. Çawa em dibêjin jiyaneke bê astetîk nabe, ango bê bedewkirin û wate lê barkirin nabe, wê edebiyateke bê ku rola jinê tê de nebe, qet nebe.

**Rola jinê di wêjeyê de**

Çawa ku civakeke bê jin nabe civak, wê demê rola jinê di edebiyatê de jî weke ya di malbat û civakê de ye. Rola jinê di edebiyatê de bi qasî hebûna wê jî girîng e. ji ber ku jin wê rola danasîna hebûna xwe bi edebiyatê bike. wê demê rola danasîna civakê jî heke bi edebiyatê pêşketiye, wê jin wê danasînê baştir bide nasîn. Rola herî zêde dikeve ser milê jin, ji ber ku divê bi riya edebiyatê şikil bide civakê, herwiha divê civakê bide hizrandin. Dema ku jin rola xwe di edebiyatê de neleyîze wê demê dê wenda bibe û bê jibîrkirin û dîroka hebûna civakîbûna jinê dê wenda bibe. Da ku jin têkoşîna jiyana azad bike, divê di nava edebiyatê de rola serke bigire ser milê xwe. Di edebiyata kurdî ya devikî de rola jinê gelekî xurt e. Ev yek bûye sedemên ku çirûskên têkoşîna jinê bêne dîtin û nasîn. Herî zêde cihê jinê di civakê de çiqasî maye ew pir baş diyar bûye. Lewre di gelek destanên kurdî de mirov dibîne û dikare asta rewşa jinê ya ku tê de ye jî fêm bike. Mînak di van destanên kurdî de hemûyan de jî jin heye, lê belê bi qasî ku rewşa heyî îfade bike jin jî tê de heye. Ji van destanan weke:

- **Mem û Zîn**
- **Siyabend û Xecê**
- **Şêxê Sîsebanê**
- **Derwêşê Evdê û Edulê**
- **Binefşa Narîn û Cembeliyê Hekarî**
- **Xanî Lebzêrin û Kelha Dimdim**
- **Zembîl Firoş**
- **Memê Alan**
- **Destana Şêxê Senan**

**Di efsaneyan de deng û rengê jinê**

Di van destana hemûyan de jî navê jinê, dengê wê û vegotinên wê jî mirov dibîne, di heman demê de rewşa jinê jî baş mirov di wir de dibîne. Diheman demê de gelek destanên ku ji aliyê desthilatdaran ve hatine wenda kirin û nehiştine deng û rengê jinê, ruhê civaka azad û wekhev îfade bike.

Heke dîrokên mirovahiyê ber bi evqasî şidet û çewtkirineke dîrokî ve çûne, ev ji ber bêrol mayîna jinê ya di dîroka civakî de ye. Heger ne wiha ba, dê terîfa jiyaneke rast bi edebiyateke rast bihatiba kirin. Da ku ev tearîf jî lewaz bimîne, hemû şêwazê wendakirina vê role û nediyariya jinê bi awayekî sîstematîk hatiye kirin. heger jin ewqasî rola wê jê hatiye girtin, ev tenê bes e ku mirov rewşa jinê baştir bizane. Lê heke ne wiha be, kî bi qasî jinê dikare cîhana xwe ya xeyalî tarîf bike û vebêje. Di heman demê de pênaseya xwezaya yekemîn û ahenga wê bi xwezaya duyemîn re, divê jin bi zimanê edebiyatê bide pênasekirin û bigihîne ruh û dilê civakê.

**Jinên di nav nivskaran de cih girtine**

Mestûre Erdelanî û Dayê Tewrêze Hewramanî jinên ku ku di nav rêza nivîskarên edebiyatê de cihê xwe girtine. ta niha jî gelek jinên kurd rola xwe di nava edebiyata kurdî ya nivîskî de lîstine û berhemên xwe yên nivîskî jî hiştine. Lê berhemên wan yên nivîskî ji ber tundiya desthilatiyê hatine wenda kirin. Ji dema mîtolojiyan û heta roja îro jî perdeyeke reş li ser hebûn, reng û dengê jinê hatiye nixumandin. Herwiha di nava nivîsên jinekê de jî mirov dikare rewşa jinan ya civakî û asta desthilatiyê baş fêm bike.

# Wêjeya zarokan

Helbestvan, çîroknivîs û nivîskarê lîstikên şanoyê bi zimanê Kurdî Alan Ebdullah ê ji Qamişlo ye, wek tevahî gelê xwe Alan ji nivîsandina bi zimanê xwe li ser çand û dîroka xwe bêpar mabû. Ji ber tunebûna nivîskarên helbest û çîrokên zarokan li herêmê, wî berê xwe da vê qadê.


Roja 2'yê Nîsanê mîna Roja Pirtûkên Zarokan a Cîhanê tê naskirin û armanca wê ew e ku zarokan ber bi xwendin û lêkolînê ve bikişîne. Ev roj ji 1967'an ve ku rojbûna wêjevanê Danmarkî Hans Andersen e, hatiye diyarkirin. Alan Ebdullah (35) bi rêya kovara Mizgîn dest bi tecrûbeya xwe ya wêjeya zarokan kir. Tê de helbest û çîrok weşandin. Di 2024'an de jî 4 pirtûkên şano yên zarokan çap kirin.

Der barê girîngiya berhemên wêjeyî yên zarokan de Alan got: "Ji gelek salan ve ji ber paşguhkirina fikrî, çandî û wêjeyî me gelek zehmetî kişandin. Ji bo avakirina civakê di aliyên fikrî, çandî û wêjeyî de pêwîstiya me bi wêjeya zarokan heye. Ji ber ku ew roleke girîng di vî warî de dilîze."

Ew 4 pirtûk bi navên Gula Pîroz, Dîsa Bişaftin, Pêşeroja Windayî û Newrozê ne. Ew jî şanoyên zarokan in. Bi rêbazeke sade û dewlemend ku zarok bikarin tê bigihîjin, zarokatî û pirgisrêkên wan ên civakî tîne ziman. Alan di pirtûkeke taybet de hemû helbest, sirûd û çîrokên xwe yên berê berhev kirin.

Der barê rewşa vê qada wêjeyê nivîskarê wêjeya zarokan Ebdulcabir Hebîb got: "Di wêjeya zarokan de pêwîstî heye ku nivîskar ji zarokan nêzîk be. Tevî girîngiya wê lê dîsa jî asta wê li herêmê ne ew asta ku tê xwestin e. Nivîskarên vê wêjeyê li ser destan tên jimartin." Li gorî agahiyên fermî yên Dîwana Wêjeyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê di 2 salên dawîn de tenê 20 berhemên ji bo zarokan hatine çapkirin. Ew jî kovar, çîrok, roman, helbest û folklor in. Tevahî bi zimanê Kurdî ne. Ev yek ji aliyê xwediyên pirtûkxaneyan ve jî hat piştrastkirin.

**Divê çi bê kirin?**







Der barê asta wêjeyî ya berhemên heyî de Hebîb got: "Ji ber kêmbûna berheman mirov nikare wan rexne bike yan jî binirxîne."Alan Ebdullah diyar kir ku dewlemendkirina pirtûkxaneyan bi berhemên ji bo zarokan û handana zarokan ji bo xwendinê ne tiştekî hêsan e û pêwîst e hemû berpirs, wêjevan, nivîskar, deste, saziyên çandî û hunermend keda xwe bikin yek. Alan wiha domand: "Pêwîst e nivîskar û wêjevan berê xwe bidin vê qadê û piştgiriya wê bikin. Ev erkê hunermendên destkariyê ye jî. Ji ber ku beşek mezin ji pirtûkên zarokan bi wêneyan ve girêdayî ye. Pêwîst e desteyên perwerdeyê di dibistanan de pirtûkxaneya zarokan veke û dersên taybet ji bo xwendinê veqetîne."

**'Nivîskarê Siberojê' teşwîqeke baş e**

Desteya Çandê ya kantona Cizîrê di 2020'an de bi navê "Nivîskarê Siberojê" li dar xist û ji wê demê ve salane li dar dikeve. Tê de bi sedan zarok bi berhemên xwe yên bi zimanên Kurdî û Erebî tev li pêşbirkan dibin. Li dawiyê berhemên herî baş tên hilbijartin û çapkirin. Hebîb der barê wê de got:"Ji bo pêşxistina rewşa wêjeya zarokan û teşwîqkirinê gaveke baş e ku nivîskar ji nifşê nû derkevin. Hêvî bi nifşê nû mezin e."



## Bûyîn Hemwelat û Hesta Hemwelatîyê

**Sîpan Şînda**

Piştî şerê cîhanê yê yekê gelek tişt hatin guhertin li ser rûyê gerdûnê. Şer bi xwe ji xwe malxirabûn bî, lê belê ji bo gelek civak û netewan guhertinên piştî şerî çêbûyîn, ji malxirabûnê ji xirabtirin.

Yek ji van gelên ku piştî şerî herî zêde di bin bandora de mayî û ji aliyê netewî, civakî, çandî, derûnî ve têk çûyî jî gelê Kurd e. Parçe kirina welatê Kurdan, parvekirina Kurdistanê di nav çar dewletan de, tişta herî xirab bû ku li ser rûyê vê gerdûnê bihata serê wan. Piştî ku welatê Kurdan di nava çar dewletan de hatî parve kirin, her yekê êdî di hinda xwe de xwestin civaka Kurd di hemî warî de biguherin. Di serî de nijada wan înkar kirin. Yekê got hûn tirkin, yê din got hûn farisin û herduyên din ji gotin hûn erebin. Paşê ji gotin hûn bê binyatin, çanda we nîne, zimanê we nîne, zimanê we ji zimanan nayê hesab kirin, navê cih û warên wan guhertin, nizam çi, nizam çi. Bi exlaqê Kurdan lehîstin û nirxên wan yên civakî û netewî bin pê kirin. Ango çi perde li ber wan nehiştin. Lê herî zêde ji bi derûnî û hişmendiya wan ya civakî lehîstin. Welê li wan kirin, Kurdan êdî ji xwe fihêt dikirin ku bêjin em Kurd in. Bi awayekî hovane û sîstematîk xwestin wan ji kesayetiya wan dûr bixin û kesayetîyeke din ya ku ew dixwazine bidine wan. Ji xwe de gelek hemên Kurdistanê di vî warî de hatin guhertin û ji kesayetiya xwe dûr ji ketin. Mînak bajarên weke Erziromê, Erzinganê, Xarpêtû, Meletî, Sêwazê hemî Kurd bîn. Lê mixabin îro ji kesayetiya xwe dûr ketine û xwe êdî tirk dibînine. Dibêjine "Babê min, yan ji bapîrê min Kurd bî, lê ez Tirk im"! Nêzîk bûn û polîtîkayên pergalê yên sed salan encam dan. Ew bê aîdîyet kirin û ji rastî û kesayetiya wan dûr xistin û kirin tirk. Lê ka em bêne li ser mijara hemwelatbûyînê û hesta wê. Erê pergalên Tirk, Ereb û Faris "nasnameyek" dane Kurdan û gotine wan hûn "hemwelatiyê me" ne; lê belê ev "nasnameya" henê tenê ji bo baştir bikaribin hikmî li wan bikine û wan ji rastiya wan dûr bixine dane wan. Hemî nêzîkbûn û polîtîkayên wan yên ji destpêka komara wan ve li ser bingehê neyartîyê ye. Berê xwe bidine polîtîkayên îro ji eynî ne û ji yên beriya 90 salan xirabtirin. Ew tu caran bi nêzîkatiyeke welê nêzîkî Kurdan nebûne ku ew xwe weke "hemwelatî" hîs bikine. Ew her tim ji xwe kêmtir dîtine û çi heq û hiqûq ji wan re qebûl nekirine. Lê belê tişta balkêş û xerîb, Kurd ji her dibêjine "em birayên êkin"! Ew hêj te înkar dike û tu ji behsa biratiyê dikî. Ka binêrin di hilbajirtinên 31î Adarê de çi kirin! Çûn bi hezaran "hemwelatiyên" xwe anîn û li gelek bajaran encamên hilbijartina bi xurtî dan guhertin. Û li ser de ji dibêjine "hemwelatiyê min". Mixabin "hemwelatî"ya ew behsê dikine, heke tu koletiya wan bikî, tu "hemwelatiyê" wan î, heke tu xulamtiya wan nekî, tu her û her neyarê wan î.

Ka bila îro herkes li vê rewşê binêre û li ser xwe mikur were, ka ew çi qeder "hemwelatî" hatîne dîtin û ew çi qeder xwe "hemwelatî" hîs dikine.

# ‘4`ê Nîsanê rojbûna gelê kurd e’

Endamên saziya malbatên Şehîdan, hunermend û rewşenbîrên bajarê Qamişlo 4’ê Nîsanê Rojbûna Rêberê Abdullah Ocalan li tevahiya gelên azadîxwaz pêroz kir û gotin, “Rojbûna Rêber Apo ji bo gelê kurd û tevahiya gelên azadîxwaz yên cîhanê, rojbûna azadî, demokrasî û wekheviyê ye.”

**Hêvî Melek/ Qamişlo**

Rêber Abdullah Ocalan di 4`ê Nîsana sala 1949`an de li gundê Amara yê girêdayî navçeya Xelfetî ya bajarê Rihayê ji dayik bûye. Navê dayika wî Uveyş e û navê bavê wî jî Omer e. Rêber Apo bi fikr û felsefeya xwe ya azad gelê kurd ji qirkirinê rizgar dike û ji bo jin û tevahiya gelên bidest bû hêviya azadiyê.

Ji ber wê roja 4’ê Nîsanê roja ji nûve zayîna civakî, çandî, fikrî û jiyaneke azad e. Zayîna Rêber Apo ji zayîneke fîzîkî wêdetir zayîneke, civakî, siyasî, fikrî û bîrdozîye. Di şexsê Rêber Apo de zayîna gelekî û ji zayîna gelekî, zayîna hemû gelan pêkhat. Rojbûna Rêber Apo di rojhilata navîn de, ji bo gelan serdemeke nû, jiyaneke nû, felsefeyek nû, fikrekî nûjen û heqîqeta mirovê azad afirand û berbelavî cîhanê tevahî bû. Di roja îro de fikir û felsefeya Rêber Abdullah Ocelan li ser bingehê paradîgmaya Netewa demokrtîk ji bo gelên cîhanê bûye çavkaniya hêvî, bawerî û nîşaneya jiyaneke wekhev û azad.

Di derbarê 4’ê Nîsanê Roja Rojbûna Rêber Apo endamê Koma Şehîd Xebat a Stran û Awazan Keder Hisên, Endama Saziya Malbatên Şehîdan Ayda Xelîl hevserokê HRRK`ê MIstefa Ebdo ji rojnameya me re axivîn.


Keder Hisên


Ayda Xelîl


Mustefa Ebdo

Keder Hisên diyar kir ku rojbûna Rêber Abdullah Ocalan ji bo gelan û bi taybet gelê Kurd mizgîniyek bû û wiha got: “Bi hatina Rêber Apo re derfet, hêvî û jiyaneke nû ji bo gelê Kurd ava bû. Netew û zimanê Kurdî ber bi qirkirin û tunekirinê ve diçû, lê bi fikir û felsefeya Rêber Apo gelê kurd kefenê mirinê çirand. Herwiha ji bo tevahiya gelên bindest bû vejîna azadiyê. Ji ber vê yekê Rêber Apo weke ronahî, vejîn û jiyanek nû da destpêkirin.”

**‘Bi felsefeya Rêber Apo cîhanê têkoşîna kurdan naskir’**

Hisên da diyarkirin ku xeta Rêber Apo xeta 3`emîn e ku xwe naspêre dewletên hegomonîk, kapîtalîzim û lîberalîzimê û wiha domand: “Bi fikir û felsefe û pirojeya Netewa Demokratîk li ser asta Rojhilata navîn, Rêber Apo ji bo gelan bû Rêberê azadiyê. Mînaka wê jî pirojeya Netewa Demokratîk e ku îro bedena wê Rêveberiya Xweser e , êdî gelê Kurd bi hêsanî bi ziman, çand, huner, stiran, govend û her tiştê ku li ser Kurdan hatibûn qedexekirin, bi riya fikir û felsefeya Rêber Apo xwe ji tevahiya cîhanê re da nasîn.

Endamê koma Şehîd Xebat Keder Hisên axaftina xwe wiha qedand: “Ev 26 salin ku Rêber Apo di girtîgeha Îmraliyê de ye û demeke dirêj çêbûye ku tu agahî di derbarê rewşa wî de nayên girtin, ji bo vê yekê jî daxwaza me ewe ku em di rojbûna Rêber Apo de wî azad di nava xwe de bibînin. Ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo em ê têkoşînê xurtir bikin.”

**‘Fikir û felsefeya Rêber Apo şoreşa azadiya jinê ye’**

Endama Saziya Malbatên Şehîdan Ayda Xelîl jî diyar kir ku ji di roja rojbûna Rêber Apo de ronahiyek derket li ser ruyê cîhanê û wiha got: “Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo gelê Kurd û pirsgirêka Kurdî xwe feda kir, em jî niha amadene ku em xwe ji bo wî feda bikin û li hemberî dijmin sekneke bi hêz nîşan bidim. Em ê bi mal, can û zarokên xwe ji bo azadiya Rêber Apo xwe feda bikin. Ronahiya ku Rêber Apo da cîhanê ne tenê ji bo gelê Kurd bû, lê belê ji bo tevahiya cîhanê bû. Bi taybet bi fikir û felsefeya Rêber Apo tevahî jinên kurd xwe naskirin û di her qadên jiyanê de bi rola xwe lîstin.

Endama Saziya Malbatên Şehîdan Ayda Xelîl di dawiya axaftinê xwe de wiha anî ziman; “Em weke jin daxwaz û peyamên me ji her kesî re ew e ku em bi hev re kar bikin û xwe fedekariyê bikin da ku em Rêber Apo di nava civaka Kurd de azad bibînin û ji navbera her çar dîwarên zindana reş û tarî derxînin. Ji ber ku Rêber Apo gelek piştgirî dide jinê û şoreşa Rojava bi navê şoreşa jinê nirxandiye.”

**Bi riya nivîsên xwe fikir û felsefeya rêber APO li cîhanê belav bikin**

Di heman çarçoveyê de hevserokê HRRK`ê Mustefa Ebdo da zanîn kuşoreşa Rêber Apo da destpêkirin, şoreşa azadiya tevahiya gelên bindest yên cîhanê bû û wiha got: “Ji ber ku fikrê Rêber Apo ne li gor berjewndiyên hêzên desthilatdar yên navneteweyî bû, van hêzan komployeke navneteweyî li dijî Rêber Apo pêk anîn. Şoreşa Rêber Apo şoreşa jin, ciwan û şoreşa tevahiya civakê bû.Herwiha bû şoreşa gelên azadîxwaz.

Ebdo da zanîn ku rojbûna Rêber Apo roja vejîna gelê Kurd bi giştî ye û wiha pê dde çû: “Bi fikir, felsefe û ramanên Rêber Apo gelê Kurd hebûn, maf û nasnameya xwe naskirin. Hewceyî gotinê ye ku barên ku dikeve ser milê rewşenbîr û nivîskaran jî ewe ku bi riya nivîsên xwe fikir û felsefeya rêber Apo li cîhanê belav bikin.”

Hevserokê HRRK`ê Mustefa Ebdo di dawiya axaftinê xwe de wiha got: “Arê Rêber Apo di zindanê deye, lê fikir û felsefeya wî herdem li derdora me ye em bi ramanên wî mezin bûn û têgihiştin. Daxwaza me ewe ku rêber Apo azad bibe û bi çavên xwe bibîne bê çawa ramanên wî li hemî cîhanê belav bûye û asta têkoşîna gelê Kurd gihaştiye asteke pir bilind.”

## Cejn û misilman



**Hafiz Ahmet Turhalli**

Hûn dizanin hemû ol û milletan de rojên kêfxweşî û pîrozbahiyê hene. Oldarên Îslamê jî, du cejnan pîroz dikin. Ola Remezanê û ya Heciyan. Me wek bawermendên ola Îslamê meha Remezanê derbas kir, neha em amadekariyên cejnê dikin. Meha Remezanê meha têgîhaştina Qur’ana pîroz e. Di meha Remezanê de ji bo Mirovê bawermend nefsa xwe paqij bike û tekamûla wijdana xwe temam bike, divê îbadet û karên qenc pêk bîne. Ji ber ku di meha Remezanê de, mirovê misilman li ser takekesiya xwe, xebatên sere rast kirinê dike, cîhada dijî nefsa xwe pêk tîne, têkoşînê dike, ev meh jî ji bo kesayetan û civakan pîroz dibe. Di jiyana mirovbûnê de têkoşîna herî girîng û zehmet, têkoşîna dijî nefsa mirovî bi xweye! Mirovên nikaribin nefsa xwe îslah û paqij bikin, dê nikaribin, ji bo derû dora xwe jî îsleh û paqijbûnê pêk bînin. Rojî girtin, muhtac û xizanan re mal parve kirin, xwe ji bo sinceke bilind amade kirin, di jiyanê de cîhad û têkoşîna herî zehmet e! Pêxemberê me sx li ser be, di vegera şerê Tebûkê de weha dibêje: “Gelî hevlan; em ji cîhada piçûk, vedigerin ber bi cîhada mezin ve” Hevalên (Sehabî) Pêxember dema vê gotinê dibîhîzin ecêbmayi dimînin! Pêxember dibêje: Eva cîhada biçûk bo me pêk anî, cîhada mezin ewe ku, em di jiyana takekesî de sererastkirinan çêkin. Cîhada dijî nefsa mirovî, cîhada herî pîroz û ya herî bi nirx e. Divê mirovê bawermend zanibe û têbighîje: Kesê li beramber nefsa xwe qelsbe, her çiqas pêşketî be jî, ew mirov di rastiyê de mirovekî têkçuyi û qels e. Kesê/Kesa di meha remezanê de li cîhada dijî nefsa xwe de bi ser dikevin û dibin xwedan şexsîyet, ew kes cejnê heq dikin. Lewre cîhad û têkoşîna herî mezin û watedar, cîhada dijî nefsê û takekesiyêye. “Kesê nefsa xwe paqij dike bêguman ew azad (xilas) dibe. Kesê nefsa xwe di nav qirêjayî û nebaşîyêde dihêle ew dibe (kole) û têk diçe”. (Şems 9-10) ji ber ku mirov tekoşîna dijî nefsa xwe de pêşketinan bi dest dixe, vê rojê weke cejnê û kêfxweşiyê pîroz dike. Cejna Remezanê ji bo em di tekoşîna dijî xirabiyên ku ji me çêbûne û çêbibin, pê dihesin û xwe ji wan dûrdixin hişmendî û kesayeta xwe jîhatî û amade dikin, wê rojê wek Cejn pîroz dikin. Di jiyana kesaytan de ger zilm, derew, şer, çavnebarî, piştgotin, fesadî û egoîzm hebe, Îbadet û pêkanînên ji rêzê, tê negîhaştina Qur’an û îbadetan dide xuya kirin. Divê kesê bawermend di meha remezanê de bi tefekkûr û îbadetan xwe ji van tiştên ne rewa û dij civakê dur bixe. Dema ji van nebaşiyan dûr ket û hefsarê nefsa xwe bi dest xist, pîroz kirina cejnê jî heq dike. Lewra têkoşîna dij nefsê û îslah kirina wê, têkoşîna herî bi watedar e. Armanca pîrozbûna meha remezanê, girtina rojî û pêkanîna îbadetan jî ji bo vê armancêne. Lê sed heyf û mixabin: Kesê qaşo meha remezanê rojiya digrin û dibêjin em oldarin, hêjî doza kuştin û xapandinan berdewam dikin. Divê baş were zanîn ku kesê doza xirabî û nebaşîyê dikin an jî ji bo nebaşiyan tevdigerin, hem ji îbadet û taatan bêparin, hem jî ji cejnan bêparin. Cejna kesên xwe paqij kirine û dijî xirabiyan têdikoşin pîroz be.

# Kewser Doko: Kongireya 4’an xwedî girîngiyeke taybet bû

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Hevseroka Partiya Sûriya Pêşerojê Kewser Doko da zanîn ku kongreya 4’an a Partiya Pêşerojê xwedî girîngiyeke taybet bû û wiha got: “Kongireya 4‘an guherînên girêng bi xwe re anîn, weke pijarandina sîstema hevserokatiyê, herwiha gelek biryar ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê hatin sitandin yek ji wan jî tekezkrina girîngiya diyaloga sûrî-sûrî û hewldana qebûlkirina Rêbeberiya Xweser.”**



Partiya Sûriyê ya Pêşerojê yek ji partiyên siyasî ye ku di 27’ê Adara 2018’an de bi kongrekê di bin durşmeya ‘Sûryeke demokrat, pirreng û nenavendî’ de li kantona Reqayê hate damezrandin. Kongra danmezrandinê bi hilbijartina Meclîsa Giştî ya partiyê ku ji 81 endaman pêk dihat, bi dawî bû. Di encama wê kongrê de Îbrahîm Elqeftan ji bo serokatiya partiyê û Hevrîn Xelef jî ji bo sikirtêra Giştî ya Partiya Sûriyê ya Pêşerojê, hatin hilbijartin.

Partiya Sûriya Pêşerojê êdî bi armanca pêkanîna Sûreyeke demokrat, pirreng û tê de mafê hemû pêkhateyên Sûriyê parastî be û bi hevbeş bijîn, xebateke siyasî da meşandin.

Navend û nivîsgehên vê partiyê li her 7 kanton û bajarên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi awayekî fermî hene. Li aliyekî din jî bi awayekî veşartî xebateke siyasî li herêmên di bin kontrola hikumeta Şamê de dide meşandin. Li gor wê jî bi destpêka sala 2024’an re Partiya Sûriyê ya Pêşerojê dest bi lidarxistina kogreyên xwe yên meclisên her kanton û bajaran, kir.

Herî dawî kongira partiyê ya çarem di 27’ê Adarê de li kantona Reqayê bi amadebûna hemû endamên partiyê, nûnerên Rêveberiya Xweser, partiyên siyasî yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û bi beşdarbûna hemû pêkhateyên Sûriyê, li dar xist. Di encama vê kongreyê de weke yekem car, ji bo hevserokatiya partiyê Kewser Doko û Ebd Hamd Elmihbaş hatin hilbijartin. Herwiha Xaliya Elkecwan weke berdevka Giştî ya Meclisa Jinê hat pejirandin. Di heman demê de ji bo hevserokatiya Meclisa Ciwanan, Izab Elcerîr û Ehmed Elcemîlî hatin hilbijartin. Li aliyekî din jî 138 kes weke endamên Meclisa Giştî ya Patiya Sûriya Pêşerojê hatin hilbijartin.

Têkildarî lidarxistina kongreya 4’an a Partiya Sûriya Pêşerojê û encamên wê, hevseroka partiyê Kewser Doko ji Rojnameya me re axivî.

**Lidarxistina 4’emîn kongreya partiyê**

Kewser Doko, têkidarî li darxistina kongra Partiya Sûriya Pêşerojê wiha dest nîşan kir: “Di destpêkê de em kongra 4’an li tevahiya gelên Sûriyê pîroz dikin. Em dizanin ku di nava 6 salan de kongreyê me yê 4’an bi rengekî demokratî di bin durşmeya ‘Partiya me pêşeroja me ye, Rêveberiya me misogeriya me ye, hêzên me serkeftina me ne û serkeftina me ye û Sûriye me dike yek, de li dar xist. Ev kongre di demeke pir hestiyar de hate lidarxistin, ji ber ku herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê di bin gefên dewleta Tirk a dagirker de ye, hertim jî rastî êrişan tê. Ji bo ku em ji bîr nekin, ev bû zêdeyî 13 salan ku aloziya Sûriyê didome û her ku diçe rewş aloztir dibe, lê dîsa bi awayekî serkeftî pêk hat. Em tekez dikin ku partiya me partiyeke sûrî ye û hemû gelên Sûriyê digre nava xwe. Kongreya 4’an, xwedî xweşbûnekê bû, ji ber ku hemû pêkhate, ji hemû ol û bawerî, herwiha rûsipiyên ku nûnernertiya herêmên xwe dikin amade bûn.

**Encam û biryarên kongreyê**

Kewser girêdayî encam û biryarên ku di kongreyê de hatin dayîn wiha got: “Di vê kongreya 4’an de piştî nîqanş û danûstandinên berfireh hin biryar hatin sitandin û encam jî diyar bûn. Yek ji van encam û biryarên kongran me ew bû ku herêmên dagirkirî yên Sûriyê tev vegerin ji gelên Sûriyê re bi taybet bidawîkirina dagirkeriya Tirk. Xurtkirina hişmendiya parastina rewa û piştgiriya QSD. Herwiha xebat li ser mijara vegera kesên winda yên ku çarenivîsa wan ne diyar e. Kongreyê tekez kir ku divê dosyaya şehîd Hevrîn Xelef were vekirin, şehadeta wê weke sûcekî şer e û pêwîste berpirsên wê kiryara hovane, werin cezakirin. Di heman demê de em hertim dibêjin ku Partiya Sûriyê ya Pêşerojê partiyeke sûrî ye, bidawîkirina aloziya Sûriyê û çarserkirina pirsgirêkên gelên Sûriyê ji biryarên kongreyê yên herî serek bû. Li aliyekî din aktîvkirina rola jin û ciwanan di nav kar û xebatên partiyê de jî ji encamên kongreyê bûn.”

**Guherînên nû û xebata siyasî ji bo dema pêş**

Hevseroka Partiya Sûriyê ya Pêşerojê Kewser Doko di derbarê guherînên ku di kongreyê de pêk hatin û xebata dema dema pêş wiha axivî: “Kongreya 4’an hin guherîn bi xwe re anîn, ji van guherînên sereke ew bû ku kongreya 4’an û xebata Partiya Sûriyê ya Pêşerojê li ser sîstema Hevpeymana Civakî bimeşe. Hêjayî gotinê ye jî ku Hevpeymana Civakî weke destûra paşeroja Sûriyê tê dîtin. Guherîna din jî pejirandina sîstema hevserokatiyê weke yekem car bû. Bi rastî di van demên borî de xebata jinê di nav partiyê de gelek berbiçav bû ji ber wê jî jin divabû cihê xwe di karê rêbebirinê de bigire. Li aliyekî din li ser hin xalan hat tekezkirin ku wê di dema pêş de xebat li ser werin kirin. Yek ji van xalan jî hewldana qebûlkirina Rêveberiya Xweseriya Demokratîk e. Sedem jî ew e ji ber ku Rêveberiya Xweser projeyeke demokratîk e û riya bingehîn ji bo çareserkirina aloziya Sûriyê tê dîtin. Herwiha Xebat ji bo rawestandina şer û bidestxistina aştiya mayinde bi riya diyaloga sûrî-sûrî ji bo pedyakirina çareseriyeke siyasî di navbera hemû aliyên sûrî de. Ev yek jî li gorî biryara 2254 ya Netewên Yekbûyî be.”



# Li hemberî êrişên dagirkeriyê hêza têkoşînê mezintir dibe

Êrîşên dagirkeriya Tirk yên li dijî herêmên Efrîn û Şehbayê bi giranî dewam dikin, di meha Adarê de ciwanek şehîd bû û yek jî birîndar bû. Koçberên Efrînê yên li Til Rifetê li hemberî êrîşên dagirkeriyê sekna gel destnîşan kirin û gotin, “Faşîzma Tirkiyê bi topbaranên rojane wê nikaribe îradeya me ya mayînê têk bibe.”

**Zana Roj/ Şehba**

Ji bilî kuştin û sûcên ku dagirkeriya Tirk û komên çeteyan di Efrîna dagirkirî de dikin, rojane koçberên Efrînê yên ku li herêma Şehbayê dimînin tên hedefgirtin. Di van hedefgirtinan de bi giştî sivîl tên armanc kirin. Her wiha zirarên madî bi gel dide jiyan kirin. Faşîzma Tirkiyê ji roja destpêka derbasbûna gelê Efrînê ji herêma Şehbayê re rojekê jî êrîşên xwe nedane rewestandin. Ev êrîş di asta yekemîn de bi armanca têkbirina îradeya gelê Efrînê û valakirina herêmê tên kirin. Lê sekin û îdiyaya berxwedanî û têkoşînê ya ku ji 6 salan ve ji aliyê gelê Efrînê tê raberkirin, hemû plan û hêviyên dagirkeriyê têk birine.

Têkildarî êrîşên dagirkeriyê li ser herêmê koçberên Efrînê Eliya Erselen û Hikmet Çûlaq yên ku li navçeya Til Rifetê dimînin ji rojnameya me re axivîn.


Eliya Erselan


Hikmet Çûlaq

**`Faşîzma Tirkiyê careke din îradeya gel hedef digire`**

Eliya anî ziman ku tu carî dagirkeriya Tirk êrîşên xwe ranawestîne û wiha got: “Ji roja derketina me bi darê zorê ji Efrînê û bicihbûna me li herêma Şehbayê dagirkeriya Tirkiyê kêliyekî jî êrîşên xwe li ser gelê sivîl nedaye sekinandin. Di qonaxa duyemîn ji Berxwedana Serdemê de faşîzma Tirkiyê bi dehan komkûjî li ser gelê sivîl û bi taybet li ser zarokên Efrînê dane pêk anîn. Her roj herêma Til Rifetê û gundê navçeya Şêrawa yê girêdayî Efrînê her wiha herêma Şehbayê ji aliyê dagirkeriyê ve tê topbaran kirin. faşîzma Tirkiyê rûxmî hemû sûc û binpêkirinên tunekirina nasnameya Kurd di Efrînê de dide meşandin, careke din jî dixwaze îradeya gelê Efrînê yên ku koçber bûne bi hovîtiya xwe têk bibe.”

**`Sivîl dibin qurbaniyên hovîtiya dagirkeriyê`**

Eliya diyar kir ku di encama êrîşên dagirkeriya Tirk de sivîl dibin qurbanî û wiha pê de çû: “Faşîzma Tirkiyê li pêşiya raya giştî dide diyarkirin ku ew hêzên leşkerî û PKK hedef digire. lê di rastiyê de rojane sivîlên herêmê ji koçnerên Efrînê û hemwelatiyên resen tên hedef girtin û şehîd dikevin. Bi taybet gundewarên nêzî Efrîna dagirkirî rojane bi tundî tên hedefgirtin. Zeviyên hemwelatiya tên bobabaran kirin, êdî gel û cotkar nikarin derbasî zeviyên xwe bibin. Weke ku di heyva Adarê de hatiye dîtin di encama hedefgirtina sivîlan de ciwanek 17 salî şehîd bû û birîndar çêbûn. Ev bûyer hemû didin eşkerekirin ku faşîzma Tirkiyê zarok, însanên temen mezin, gelê sivîl û hêzên leşkerî hedef digire.”

**Li hember qirkirinê... xurtkirina têkoşînê**

Herwiha Hikmet anî ziman ku armanc ew e ku îradeya gelan têk bibe û wiha domand: “Em hemû nêzîkatî û dijminahiya faşîzma tirkiyê li hember gelê Kurd dizanin. Dagirkeriya Tirkiyê bi dagirkirina Efrînê re nikarî bigihîna armanca xwe ya sereke ew jî tunekirina hêvî û îradeya gelê Kurd ya azadî û demokrasiyê. Ji bo gelê Efrînê jî ev yek armanc dikir û bi hemû êrîşên hovîtî, rê û rêbazên qirkirinê tenê dixwaze îradeya gelê ku ji 50 salî ve li pey felsefeya azadiyê ya Rêber APO dimeşe têk bibe. Gelê Efrînê li herêma Şehbayê dîrokeke nû ya îradeya berxwedaniyê û têkoşînê nivîsandiye. Ma îradeya gelê ku li ser bîrdoziya Rêbertî mezin bûye têk diçe?. Em bi doza xwe bawrin û em her roj bi hêviya vegera Efrînê jiyan dikin û têkoşîna li hember dagirkeriyê mezin dikin.”

Hikmet bi van gotinan axaftina xwe bi dawî kir û wiha got: “Berxwedaniya ji 6 salan ve li hember êrîşêm dagirkeriyê, dorpêça Hikumeta Şamê û siyasetên ku li ser me tên meşandin kêliyekê jî nehatiye rawestandin. Li ser van bingehan tu hêviyên me bi kesekî û hêzekî nîne. Em baweriya xwe tenê bi şervanên warê zeytûnê û felsefeya Rêbertî tînin. Mayîndebûna me li vir hemû pilanên dijmin têk birine.”

**Li gorî bîlancoyên Navenda Ragihandina HRE’yê êrîşên meha Adarê wiha ne:**

Di roja 4’ê Adarê balafira keşfê a dewleta tirk a dagirker bi 5 rokêtên li gundê Alqamiyê bombaran kir. Di encama bombaranê sivîlek birîndar bû. Di roja 10’ê adarê Druna xwekuj a dewleta tirk a dagirker li gundê Kefer Anton xwe teqandin. Lê tu zirar Ninin. Di roja 13’ê adarê Druna xwekuj a dewleta tirk a dagirker li gundê Soxanekê xwe teqand lê tu zirar çênebûye. Di roja 14’ê adarê Druna xwekuj a dewleta tirk a dagirker 2 caran li gundê Soxanekê xwe teqand lê tu zirar çênebûye. Di roja 16’ê adarê Druna biçûk a dewleta tirk a dagirker bi 1 rokêt gundê Şewerxa bombaran kir, di encamê de tu zirar çê nebûye. Di roja 17’ê Adarê li gundê Alqemiyê ya navçeya Şera a kantona Efrînê, Keşfek mezin xistin. Di roja 17’ê adarê li gundê Bêlûniyê ya navçeya Til Rifatê welatiyên ku di nava zeviyên xwe de kar dikin kirin hedef, di encamê de ciwanekî 17 salî şehîd ket û yek bi temenê 43 salî jî birindar bû. Navê Şehîd: Elî Ebdulrehman Mihemed Navê Birindar: Mihemed Mihemed Sebrî Xalêt.

Di roja 23’ê Adarê li nêzî metheneya feysel ya nêzî baregeha rûsya drunek xwekuj bombe baran kir, di encamê de zirar nînin. Di roja 29’ê Adarê li gundê Şewarxa ya navçeya Şera ya kantona Efrînê, Druna bi çûk 6 gule li gund bombe baran kir, li gund zirarê madî çêbûn. Di roja 30’ê Adarê li gundê Malikiyê ya navçeya Şera a kantona Efrınê Drunek xwekuj a dewleta Tirk a dagirker bombe baran kir. Di roja 31’ê Adarê Drunek xwekuj ya dewleta tirk a dagirker gundê Şealê ya kantona Şehbayê bombe baran kir, di encamê de zirar madî ne.

HÊJMARA GIŞTÎ: Hêjmara Giştî Guleyên Obîsan: 773, Hêjmara Giştî Guleyên Hawanan: 615, Hêjmara Guleyên Tangê: 195, Hêjmara Giştî Guleyên Bombetar: 165, Hêjmara Giştî Keşfên hatine xistin: 1, Hêjmara Giştî Drunên Xwekuj: 10, Hêjmara Giştî Lêdanên Guleyên Drunên bi çek: 24

# Li hemberî qutkirina avê li Şehbayê; Altirnatîvên çareseriyê

**Vîndar Roj/ Şehba**

**Zêdeyî 2 mehane ku av ji aliyê UNICEF av li ser koçberên Efrînê yên li herema Şehbayê hatiye qutkirin. Hevserokê Komîteya Avê ya Kantona Efrîn û Şehbayê Sîdo Henan diyar kir ku bi hatina demsala havînê re wê rewşa kampan aloztir bibe.**



Di çarçoveya siyaseta dorpêça hikumeta Şamê li ser gelê Efrînê li herema Şehbayê, rêbaz û pilanên nû li ser gelê heremê tên meşandin. Yek ji wan siyasetan jî qutkirina avê li ser û bi taybet li ser gelê kampan de ku ji 6 salan ve berxwedaniyê dikin. Weke ku me dabû diyar kirin di 15 ê Sibatê de ji aliyê Rêxistina UNICEF ve biryara qutkirina avê li ser tavahî herema Şehabyê hat standin û ev biryar di cih de ket meryetê.

Biryara qutkirina avê bi siyaseta dorpêşa hikumeta Şamê ve girêdayî ye. Di sala 2022 an de av bi temamî li ser gundên heremê qutkirin. Rûxmî ku tê zanîn herema Şehbayê heremek binasaziya wê di encama şerên ku hatine rûdan de, ne saxleme û rûxandiye. Av bi giştî li heremê kêm e û bîrên ku hene jî demkî ne. Bi giştî lêi herema Şehbayê peydakirina av paqij ji xwarin û vexwarinê re pir zehmet e.

Têkildarî berdewamkirina qutkirina avê li ser heremê ji aliyê Rêxistina UN ê ve hevserokê Komîteya avê ya Kantona Efrîn û Şehbayê Sîdo Henan ji rojnameya me re axivî.

**`Qutkirina avê yek ji siyasetên dorpêçê ye`**

Sîdo di destpêkê de anî ziman ku biryara qutkirina avê li ser koçberan ne di cih de ye û ev yek ji pilanên siyaseta dorpêça Hikumrta Şamê ye û wiha pê de çû: “Siyasetên hikumeta Şamê yên ji bo bêzar kirin û îradeşikandinê li ser gelê Efrînê li herema Şehbayê zêdetirî 6 sala ye tê domandin. tavahî siyasetên ku dane meşandin bandora xwe li ser gelê heyî nekiriye û têkbirina pilanên tê meşandin tekez kirine. Hikumeta Şamê vê carê jî bi qutkirina avê ya ku bingeha jiyanê ye dixwaze bigihîne hin armancên xwe. Biryara qutkirina avê li ser gelekî ku rewşa koçberiyê de jiyan dike ji xwe ne rewa ye û pîvanên mirovî û exlaqî bin pê dike”.

**`Zehmetiyên cidî wê derkevin`**

Sîdo diyar kir ku qutkirina avê wê rê li ber zehmetiyên cidî di kampan de vebike û wiha got: “5 kampên ku gelê Efrînê tê de jiyan dikin hene, derbaskirina avê ji bo kampan divê rojane bê kirin. rojane zêdetirî 4,750 bermîlên avê ji aliyê rêxistina UN ê ve derbas dibû, rûxmî ku pêwîstiya gel ji viya zêdetir bû. Lê di sala 2022 an de bi gîştî av li ser heremê kêm kir”.

Sîdo wiha dirêjahî da axaftina xwe: “Kampên koçberan em xixwazin nexweazin rewşên wan taybetin. Em mecbûrin her roj pêwîstiyên wan yên rojane temam bikin. Di demsala zivistanê de pêwîstiya zêde bi avê nîne, lê demsala havînê bê av derbas nabe. Bi taybet di kampan de kêmkirina avê divê neyê kirin û ji 6 salan ve em hewil didin ku bi carekî av li ser kampan neyê qutkirin. Ger ev biryar bi vî awayî û bê çareserî bê berdewam kirin em bawerin wê rewşa kampan zehmetir bibe û rê li ber kirîz û nexweşiyên cidî bê vekirin”.

**‘Derfetên heyî têra çareserkirinê nakin’**

Her wiha Sîdo anî ziman ku ew hewil didin rêbaz û pirojeyên peydakirina avê li heremê dikin û wiha got: “Bê guman rewşa ku tê jiyan kirin cidî ye, lê ji aliyê me ve hemû hewildanên çareserkirina vê yekê tê kirin. Niha rojane nêzî 1700 bermîlên avê li ser her kampekê tê belavkirin. Bi giştî ji Til Rifet heyanî Fafînê 18 menhelên avê di destê me de hene û nîzî 170 aliyatên ku wê avê li ser giştî gundên heremê belav dikin hene. Lê weke ku tê zanîn em rojane kirîza tunebûna sotemeniyê jiyan dikin. ji bo ku ev menhel û aliyat bi awayekî aktîv kar bikin pêwîstî bi sotemeniyê heye.”


**Rêbazên çareseriyê**

Sîdo wiha axaftina xwe domand: “Ji bo derbas kirina vê rewşê em weke komîteya avê ya navendî her wiha bi Desteya Deredariya heremê û bi alîkariya Heyva Sor A Kurdî re em li ser peydakirina riyên çareseriyê û pirojeyên nû dixebitin. Yek ji wan jî hin menhel hene divê ji nû de bên çêkirin, her wiha kolandina bîran wê were kirin, di heman demê de em hewil didin careke din bi rêbaza enerjiya rojê ji bo av derxistinê bixin meryetê. Lê tavahî rêbazên ku em hewi didin bikin wê ne têrker bin ji ber herem di bingeh de feqîrtiya avê jiyan dike.”

Di dawiyê de Sîdo banga hemû aliyên têkildar kir ku ji rewşa heyî re bibin çareserî û wiha got: “Li hember rewşa ku li herema Şehbayê û bi taybet di kampên koçberan de tê jiyan kirin. Em hemû rêxistinên mirovî yên navnetewî sûcdar dibînin. Ji erka wan ne ji vê rewşê re bibin hêza çareserî û rê nedin ku siyaseta Hikumeta Şamê jiyana mirovahiyê bixe xeteriyê.”

# Bi kurtî jıyana Rêber Abdullah Ocalan...(2)

Li ser daxwaza rêveberiya Sûrî, Rêber Apo di 9’ê Cotmeha 1998’an de bi balafirê ji Sûrî derket û şeva heman rojê çû paytexta Yewnanîstanê Atînayê. Lê belê, ruxmî ku li ser navê rêveberiya Yewnanîstanê hatibû vexwendin jî ji aliyê Şefê Îstixbaratê yê Yewnanîstanê ve têketina wî ya Yewnanîstanê hat astengkirin. Rêber Apo bi balafirê derbasî paytexta Rûsyayê Moskowayê bû û domahiya 33 rojan li Moskowayê ma. Meclîsa Dûmayê mafê îltîcayê da Rêber Apo. Encax rêveberiya Rûsyayê li beramberî “Projeya Herikîna Şîn (Blue Stream)” ji Rêber Apo xwest ji Rûsyayê derkeve. Piştî ku rêveberiya demê ya Îtalyayê germ nêz bû Rêber Abdullah Ocalan di 11’ê Mijdara 1998’an de bi rengekî nîv-fermî çû Romayê. Li balafirgeha Leonardo Da Vîncî hat binçavkirin. Ewropayê Rêber Apo wekî “persona non grata”, yanî “kesê ku nayê xwestin” îlan kir û ji bo ku neçe devereke din hemû rê li ber girtin. Li ser helwestên neyênî yên rêveberiyên Fransa û Elmanyayê rêveberiya Îtalyayê ket zehmetiyê. Li ser vê yekê Rêber Apo derketina ji Romayê guncav dît û di 16’ê Çileya 1999’an de dîsa çû Rûsyayê. Bi planeke ku tê de îxanet jî hebû ji Rêber Apo re hat gotin ku “Xwestekên te ji aliyê hikumeta Rûsyayê ve hatine qebûlkirin” û bi vî rengî Rêber Apo ber bi Rûsyayê ve hat arastekirin. Piştî sê rojan di 20’ê Çileyê de ji bo ku di ser Ermenîstanê re derbasî Kurdistanê bibe derbasî balafirgehê hat kirin. Encax di kêliya dawî de hat gotin ku ev pêk nayê û bi zorê li balafireke kargo siwar kirin û birin paytexta Tacikîstanê Dûşanbeyê. Li Tacikîstanê li maleke gund nêzî hefteyekê hat girtin û di 28’ê Çileyê de careke din anîn Moskowayê. Li ser esasê qaşo “qebûlkirina rêveberiya Yewnanîstanê” di 29’ê Çileya 1999’an de bi balafirê careke din derbasî Atînayê hat kirin. Çend rojekî li vir ma. Dûvre şeva 31’ê Çileyê li hewayê hat gerandin û daket paytexta Rûsyaya Spî Mînskê. Li wir ji balafirê daneket û ji wir derbasî Girava Korfû ya Yewnanîstanê hat kirin. Li vir du rojan ma. Li ser navê hikumeta Yewnanîstanê soz hat dayîn ku “wê wî bibin Efrîkaya Başûr” û di 2’yê Sibata




1999’an de ew birin Sefaretxaneya Yewnanîstanê ya li paytexta Kenyayê Naîrobiyê.
Polîsên Kenyayî Rêber Apo bi darê zorê ji Sefaretxaneyê derxistin, ji yên li gel wî cuda kirin û dûvre bi seyareyeke bi modela cîpê revandin. Li ser esasê hevpeymana CIA-MÎT’ê û bi erêkirina rêveberiya dewleta Tirk li balafirgeha Naîrobiyê teslîmî kontrgerîlayên Tirk hat kirin. Dîrok 15’ê Sibata 1999’an bû. Balafireke ku dewleta Tirk kirê kiribû Rêber Apo ji Kenyayê girt, di ser Misrê re bir Stenbolê. Di 16’ê Sibatê de di saet sisê û nîvan de balafirê li Stenbolê depoya xwe ya sotemiyê tijî kir û dûvre derbasî Bandirmayê bû. Ji vir bi keştiyeke eskerî Rêber Apo birin girava Îmraliyê. Îmralî, giraveke girêdayî Bûrsayê ye. Demeke dirêj wekî girtîgeheke nîv-servekirî hat bikaranîn. Piştî kompoloyê ji nû ve hat dîzaynkirin. Heta pêvajoya Kompoloya Navneteweyî ya 15’ê Sibatê li Îmraliyê 247 hikumxwar hebûn. Piştî vê, sîstema Îmraliyê wekî sîstemeke qirkirinê ya yek kesî hat vesazkirin. Rêber Apo li Îmraliyê bi statuyeke rehîne ya li derveyî hiqûqê û di nava şert û mercên tecrîda mûtleq û êşkenceya sîstematîk de tê ragirtin. Sîstem û rêzikên Îmraliyê ji nû ve hatin avakirin û statuyeke taybet hat pêşxistin. Êşkence û tecrîd bi rêkên derveyî hiqûqî bi hiqûqa kompoloyê hatin fermîkirin. Rêber Apo di nava şert û mercên qirkirin û êşkenceya Îmraliyê de nefes bi nefes xebitî, ji bo ku karibe Tevgera Azadiyê pêş bixîne û tevkariyê li pêvajoyê bike her tim nirxandin û perspektîf pêş xistin. Beşeke mezin a paraznameyên xwe di nava şert û mercên hucreya di nava hucreyê de nivîsand. Di dema nivîsandinê de jî bi piranî pirtûkên ku li ser lêkolîn dikirin, pênûsa ku pê dinivîsand û kaxizên ku li ser wan dinivîsand dihatin desteserkirin. Ruxmî van şert û mercan jî paraznameyên xwe nivîsandin.
Dadgeha Îmraliyê di 29’ê Hezîrana 1999’an de cezayê îdamê li Rêber Apo birî. Feqet têkoşîna ku gelê Kurd û dostên wê bi pêşengiya çalakgerên “Hûn Nikarin Roja Me Tarî Bikin” ji 9’ê Cotmeha 1998’an heta 15’ê Sibatê û dîsa di dema mehkemeyê de meşandin, her wiha têkoşîna gerîla nehişt ev biryar bê pêkanîn. Li ser vê yekê di 2’yê Tebaxa 2002’yan de ji qanûn û destûra bingehîn cezayê îdamê hat derxistin û li şûna wê “hepsa muebbet a girankirî” hat bicihkirin. Bi vî rengî cezayê îdamê yê ku li Rêber Apo hatibû birîn di warê hiqûqî de jî hat guhertin.
Rêber Abdullah Ocalan di 21’ê Adara 2005’an de bi danezanekê wekî pergala gel a demokratîk damezrandina Sîstema Konfederalîzma Demokratîk (KCK) îlan kir.
Di 14’ê Sibata 2007’an de li gorî rapora ku gihişt PKK’ê doktoran tespît kirin ku Rêber Apo bi jehra arsenîkê tê jehrîkirin. Doktorê ku li Îtalyayê tetkîk kirin di 1’ê Adarê de ev encam bi raya giştî re parve kirin.
Di 2’yê Tîrmeha 2008’an de ruxmî ku di talîmnameya girtîgehê de tine ye jî ji Rêber Apo re gotin ku ew ê porên wî traş bikin û porên Rêber Apo bi zorê jê kirin.
Di 17’ê Mijdara 2009’an de hucreya lê dima hat guhertin û ew birin odeya 6 metrekaroyî ya ku wekî “çala mirinê” bi nav kir. Ev wekî ceza danê. Heman salê ji bo ku raya giştî ya hundirîn bixapînin û zexta raya giştî ya derve kêm bikin 5 endamên PKK’ê derbasî Îmraliyê kirin. Hevdîtina Rêber Apo û hevalên din ên rehîne yên birin Îmraliyê jî bi temamî bi pêkanînên keyfî tê diyarkirin. Îro li Îmraliyê li gel Rêber Apo 3 rehîneyên din ên PKK’yî tên ragirtin.
3’yê Çileya 2013’an cara yekemîn heyeteke sivîl a ku ji parlamenterên HDP (Partiya Demokratîk a Gelan) û nûnerên dewletê pêk dihat çû girava Îmraliyê.
Sifatên Rêber Abdullah Ocalan ên ku îro bi awayekî fermî tên bikaranîn ev in: Rêberê PKK’ê, Rêberê Gelê Kurd, Rêberê Konfederalîzma Demokratîk.
Aîdî Rêber Apo gelek belge, nivîs, dahûrandin (nivîskî û dîtbarî), broşur, nivîsên berhevkirî, peyam, not, perspektîf, talîmat hene. Her wiha zêdetirî sed berhemên wî yên wekî pirtûk hene û ev ji bo gelek zimanan hatine wergerandin.

**WEŞANÊN AKADEMIYA ZANISTÊN CIVAKÎ YA ABDULLAH OCALAN**



## Di hilbijartinan de serkeftina gelê Kurdistanê pîroz be!

**Ahmet Aktaş**

Di hilbijartinên xwecihî yên 3’ê Adara 2024an de, gelê Kurdistanê serkeftinek watedar bi dest xist.
Di van hilbijartinan de, hevbendiya rêvêberiya faşist a AKP-MHP û HUDAPAR a qontra derbeyek mezin xwar.
Di kesayetiya DEM PARTIYÊ de li himber destkeftiyêen gelê Kurdistanê, êdî mirov dikare bibêje, siyaseta qirker-nijadkuj-kujer a dewleta tirk, dikeve qonaxa serberjêr.
Heta 1ê Nîsanê, dîktatoriya AKP-MHPê, li ser civakê di asta herî jor de, xwedî serdestiya siyasî, leşkerî, aborî, îdarî û hwd. ya hemû qadan bû. Belê niha, çerxa çarenûsa siyaset û kiryarên vê diktatoriyê berevajî bûye û berê xwe dayê xerabûnê.
Ev destkevtina bi rûmet a 31ê Adara 2024a, bêgûman encamê biryar û xebata Rêbar APO ya ji NEWROZA 1973an a Çubuka Enqereyê hat despê kirin û di salên li pey wê de ji aliyê şopdarên wî ve hat dewam kirin e; ev ruh û ev îrade bi evîndariyek canbexşane ji aliyê Mezlûman, Mehsûman, Zîlanan, Bêrîtan û Bêrîvan ve hat mezintir kirin û di 8ê Adar û 21ê Adara 2024an de hat tacîdar kirin e!
Hilbet di vê pêvajoya dirêj de û bi taybetî jî di vê dema dawî de, bi saya serpêhatiyên xwe yên lehengî ve dewlemendkirin û bilindkirina asta stratejîk û tektîkên hemdemî, her wiha bi mizginîya afirandrina çêkên nûjen ên kêrhatîtir ên dijî çekên dewletê, gerîlayên Azadiya Kurdistanê, rola xwe ya taybet a di şoreşa Kurdistanê de dîsa nîşan da û coşa Newrozê û Hilbijartinan bilindtir kir.
Bêgûman rêveberiya dewleta faşîst, li himber vê destkeftiya mezin bêdeng namîne û li goreyî wê amadekariyên xwe yên şerekî mezintir despê kiribû.
Di vê çarçovê de serokê MIT û wezîrên xwe yên şerxwaz, lezgîn xistibû ser rêya diplomasiye ji bo şerê giran li dijî deskeftiyên gel û Tevgêra Azadiyê.
Ew gera wan a DYEyê, Bexdayê, Erbîlê û hwd. ên peywendîdarên vê mijarê, hemû amadekariyên şer bûn.
Her çendîn R.Erdogan di axaftina xwe ya balkonê de, binkevtina xwe veneşart û nerm peyivî jî, lê gefê xwe yê li gelê Kurdistanê dîsa dubare kir, jixwe êrîşên wan ên li hundur di roja yekê de despêkir, li Bedlîsê, Şernexê, Şemzînanê, Qilebanê û hwd.bi rêya dengdana polis û fermandarên leşkerî yên ne xwecih, bi darê zorê şaredarî xistin destê xwe.
Li Wanê mafê Abdullezîz Zeydan ji dest girtin, maf dan nûnerê AKPê, li Hîlwanê encam dan rawestandin, hilbijartin ji nû ve çêdibe û hwd.
Wisa diyare ji derbeyên siyasî, dadigerî û leşkerî, heta qeyûman çi ji destên wan bê wê bikin.
Gelê Kurdistanê û Tevgêra Azadiyê jî bêbersîv nema ye, him li Wanê him li piraniya bajaran xwepêşandanên piştgriyê tên birêvebirin; mafê Zeydan hat standin.
Ev ruhê berxwedêr derbasî qonaxa nuh dibe, wisa xuya ye ku êdî ev ruh, wê di van rojên nasyar ên mîna 8ê Adarê, 21ê Adarê û 4ê Nîsanê, derbasî 1ê Gulanê, 18ê Gulanê, 14ê Tîrmehê, 15ê Tebaxê, 1ê Îlonê, derbasî 27ê Mijdarê û hwd.bibe û bi vî awayî pira rihê berxwedanê û serîhildanê di nava 365 rojên salê de tê ava kirin û di encamê de Şoreşa Kurdistanê pêktê.

# Hilbijartinên herêmî yên Tirkiyê û Bakur

**Volqan Elî**

Sih û yekê meha Adarê li Bakûr û Tirkiyê hilbijartinên herêmî hatin kirin. gelê Kurd û hêzên demokrat di bin banê DEM Partî de vîna xwe dan der. Hema bêje hemû bajar û navçeyên xwe yên ji aliyê qeyyuman ve hatibûn desteserkirin, girtin. Hem li Kurdistanê û hem jî li Tirkiyê çend cih, li xwe zêde kirin. Hûrguliyên vê pir zêde ne. Mînak li Bakur şaradariyên qet nebûne yên gel yan jî hin caran hatine girtin lê cara dawî ji dest çûne jî hene: Erzerom, Xerpêt, Qers, Şirnex, Semsûr û hwd, encam bi xetên giştî wisa bin jî ji xwe rewşa niha heyî ne encamên misoger ên fermî ne; dibe ku bên guherîn.
Wekî me gotiye, hûrguliyên wê pir in û dê hê bi rojan, bi mehan ji aliyê her kesî ve li ser axavtin çêbibe. Lê dîsa jî yek dikare li ser rewşa giştî çend tiştan bêje. Ya din jî ji beriya vê hilbijartinê hesabê dewleta dagirker, hesabê Tayip ew bû ku li Rojav û Başûr derkeve seferê dagirkeriyê. Ev plan hê jî di rojevê de ye. Ji beriya wê şaredariyên bajarên sereke yên Tirkiyê û hin ên Bakur bigire. Lê hin tiştên bi hilbijartinê, berûvajî bûn. Herî kêm encam, ne wekî dixwestin derket.
Di hilbijartinên Bakur û Tirkiyê de tiştek teqez bû; Tayip Erdogan li xwe mukur hat ku vê carê têk çûye. Li gorî dîtina me, ev ya herî girîng bû. Çima? Ji ber ku ev destpêka binkeftina pergaleke xwînmij ku li ser ked û xwîna gelan hatiye avakirin nîşan dide. Îro li Tirkiye û Bakurê Kurdistanê faşîzmeke req, tariya herî tarî, zilamperest, yekperest serdest e. Li gorî vê hişmendiyê, li gorî fikra şexsî ya Bahçeli û Erdogan jixwe dema ku ‘pêşeroja Tirkiyê bû mijar, hilbijartin û tiştên din hûrgulî ne’. Ev, nîşan dide ku li Tirkiyê şaradarî, parlemen, hilbijartin, mafên mirovan û hwd. hwd. Wekî hin lîstokan, wekî xapandina raya giştî ya cîhanê û gelê Kurd û gelê Tirkiyê tê dîtin. Jixwe ji beriya van hilbijartinan nîqaş hebû ku qeyyumekî li şûna şaradarê Stenbolê diyar bikin. Faşîzma MHP-AKP pergala qeyyuman tenê ji bo Kurdistanê nedifikirî û nafikire jî. Îro li Tirkiyê ji sedî 99’ê welatiyan ji dewletê zêdetir dewletperest û nijadperest e. Ev bi hewldana bi dehan sal a pergala faşîst wisa bûye. Yanî hema bêje wekî ku di nava qeloxa seriyê her kesî de dewletek hebe, qeyyumekî hişmendiya faşîst hebe… Wate û manaya herî sereke ya faşîzmê ev e. Dibêje ‘ne pêwîste gel bihizire ez ê li şûnê bihizirim, ne pêwîste Kurd şaredarên xwe hebin, em ê ji Enqerê yekî bişînin bila ew bibe şaredar’.
Ne tenê ev, qeyyum ne tenê li şûna şaradariyekê dihizirin. Em ê mînakekê bidin, hûn ê bêjin ‘çi peywendiya vê bi hilbijartinan û qeyyum heye’. Hişmendî û feraseta qeyyum û faşîzmê digihîje vê: Di demên derbas bûyî de li Tirkiye û Bakur çend Kurd ji ber ku bi Kurdî stran gotibûn ji aliyê nijadperestan ve hatin kuştin. Çima? Çima bi Kurdî stran dibêje? Çima bi Tirkî nabêje? Angu li şûna zimanê Kurdî, Tirkî wekî qeyyum diyar dike. Ma ne Ahmet Kaya wisa linç kirin, rejm kirin?
Niha li Tirkiye bi deh hezaran zindaniyên Kurd, yan jî girtiyên ku ji pergala faşîst cuda dihizirin hene. Ev jî mînakeke din a qeyyum û hişmendiya faşîst e. Yanî dibêje ‘ji dewleta faşîst cuda nehizire, li vî welatî her kes, Tirk e, Misilman e, Sunne ye, nijadperest e, zilam e û hwd.’ dema ku welatiyek vê faşîzma ji keviran reqtir û ji tariya dojehê tarîtir guhdar nake jî wî/wê ji ser kar û jiyana asayî digirin û diavêjin zindanê; jixwe eger welatiyeke/î bê wezîfeya fermî ya dewletê be li şûnê qeyyum jî diyar nakin. Yanî ji kîsê xwe diçe zindanê!
Vayê çend tiştên ku me li jorê behs kirî dibe ku ji encamên faşîzma qeyyumperest çendek bin, heta pir girîng bin jî; lê wekî ji ava deryayekê çend dilop bin: Ewqas. Dibe ku hûn bêjin ‘ma tu çawa evqas tiştan bi derûniya ji ber hilbijartinê xirabûyî ya Tayip ve girêdidî?’ Dibe ku hûn rast jî bin. Lê dema ku mirov dihizire ku pergala faşîst a dewleta Tirk, li ser êş û xwîna gelê Kurd a sedan sal û bi taybetî jî çilpênce salên dawî xwe ava kiriye, têkçûna ji aliyê derûnî ve ya serkêşê faşîzma Tirk wekî pir tiştekî biçûk xuya be jî dîsa girîn e. em ji bîr nekin; dawiya Nemrût jî bi pêşiyekê dest pê kir.



# Qonaxa Nû ya Çalakiya Girtiyên Azadiyê

**Çalakiya girtiyên azadiyê ya li girtîgehên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê ku bi daxwaza azadiya Rêber Abdullah Ocalan û çareserkirina pirsgirêka kurd di 27’ê Mijdara 2023’yan de bi greva birçîbûnê ya bêdem û dorveger hatibû destpêkirin, di 4’ê Nîsana 2024‘an derbasî qonaxeke nû bû. Di qonaxa nû de çalakî bi boykotkirina hevdîtinên ser telefonê, malbatan û dadgehê didome.**

**Navenda Nûçeyan**

Girtiyên azadiyê bi daxwaza azadiya Rêber Abdullah Ocalan û çareserkirina pirsgirêka kurd di roja 133 yan de didome. Girtiyên azadiyê li girtîgehên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê di çarçoveya kampanyaya cîhanî ya “Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji bo pirsgirêka kurd çareseriya siyasî” di 27’ê Mijdara 2023’yan de dest bi greva birçîbûnê ya bêdem û dorveger kiribûn. Girtiyan destnîşan kiribûn ku heke heta 15’ê Sibatê roja kompoloya navneteweyî ya li dijî Rêberê PKK’ê Abdullah Ocalan neyên qebûlkirin, dê çalakiya xwe derbasî qonaxeke nû bikin.
Girtiyên siyasî piştre di di 12’ê sibatê de bi daxuyaniyekê ragihandin ku ji bo çalakiya wan bandorê li xebatên hilbijartinê neke, biryar dan ku dê piştî hilbijartinê çalakiya xwe derbasî qonaxeke nû bikin. Girtiyên PKK û PAJK’î di 3 Nîsanê de bi ser navê Denîz Kaya daxuyaniyek weşandin û ragihandin ku ew bi boneya 4’ê Nîsanê Roja jidayikbûna Rêber Abdullah Ocalan, çalakiya xwe ya greva birçîbûnê bi dawî dikin û çalakiya xwe derbasî qonaxeke nû dikin.



**Çalakî derbasî qonaxeke nû bû**

Girtiyan di daxuyaniya xwe de wiha gotin: “Em çalakiya xwe ya greva birçîbûnê ya dorveger a ku me heta niha dimeşand, di 4’ê Nîsana 2024’an de bi dawî dikin, rojbûna 75’an a Rêberê xwe, lehengiya kedê ya mezin bi hezkirin û dilsoziyeke mezin silav dikin, 4’ê Nîsanê ku rojbûna azad e di serî de li Rêber Apo li şehîdên têkoşîna azadiyê, li gerîlayên bi fedaî şer dikin, li gelê me û gelan pîroz dikin. Em dixwazin ragihînin ku em ê pêngava xwe ya ‘Azadî ji Rêber Apo re, çareseriya demokratîk ji pirsgirêka Kurd re’ ji 4’ê Nîsanê û pê ve bi dirûşma ‘Jiyana bi Rêberê xwe re ya di heman şertî de’ bi boykotkirina dadgeh, serdana malbatê û axaftina bi telefonê bimeşînin.”

**Berxwedana girtiyan di roja 133’an de didome**

Çalakiya girtiyên siyasî ya bi daxwaza azadiya Abdullah Ocalan û çareserkirina pirsgirêka ku di 27’ê Mijdara 2023’yan de bi greva birçîbûnê ya bêdem û dorveger hatibû destpêkirin, di roja 133’emîn de bi qonaxeke nû, bi çalakiya boykotkirina hevdîtinên ser telefonê, malbatan û dadgehê didome.

# ‘Qonaxa duyem a pêngava cîhanî a azadiya Rêber Apo qunaxa berxwedanê ye’

**Ayşa Silêman/ Qamişlo**

Endama Meclisa Giştî ya PYD’ê Ahîn Elî diyar kir ku di Newroza 2024’an de qonaxa yekem ji pêngava ji Rêber Apo re azadî û ji pirsgirêka kurd re çareserî giha lûtkeya xwe û niha jî qonaxa duyem dest pêkir, divê qonaxê de berxwedan û gelecana gel zêdetir bûye.

Di derbarê destpê kirina Qonaxa Duyem ji Pêngava Cîhanî ya ‘Ji Rêber Apo re azadî û ji pirsgirêka kurd re çareserî’ Endama Meclisa Giştî ya PYD’ê Ahîn Elî bersiva pirsên Rojnameya me da û Hevpeyvîn wiha bû:



**-Qonaxa yekem a pêngavê derbas bû, Newroz bû lûtkeya qonaxa duyem, hûn mesajên ku gel di Newrozê de dan ji bo pêngavê çawa dinirxînin?**

Di serî de Newroza 2024’an li Rêber Apo, berxwedêrên zindanan, azadîxwazên û li Şoreşa jinê pîroz dikin. Newroza îsal ne wek ya tu salan bû, ev Newroz temsîliya Kawayê hemdem dikir, temsîliya berxwedanî û qehremantiya Kawayê Hesinkar heya roja îro dikir. Kelecan û coşa di hundirê civakê de ne normal bû, tevî ku meha remezanê bû jî lê eşqa civakê ji vê rojê re derket holê. Girêdana wan bi Rêber Apo re di heman demê de daxuyaniya HPG’ê jî coşek gelek mezin çêkir. Hat isbatkirin ku îradeya civakê ji her teknîk û cûreyên şerê cîhanê xurtire. Di Newrozê de jî hat dîtin ku tevî rewşa avhewayê ya neguncaw jî lê dîsa gel girêdana xwe bi Rêber Apo re nîşan didan. Di Newrozê de gel di got ku azadiya Rêber Apo azadiya civakê ye. Rêber Apo 25 sal di bin tecrîdê de tekoşîn û berxwedaniyeke bêhempa dide meşandin. Ji bo vê yekê divê gelê wî jî xwedî lê derkeve. Bi vî rihî dihat diyarkirin ku gel di hemû axaftinên xwe de Newroza 2024’an li Rêber Apo pîroz dikirin. Dirûşmeya pêngava me bû dirûşmeya Newrozê jî, bi vî awayî girêdana gel bi Rêber Apo re hat xuyanî kirin, herwiha di 15’ê Sibatê de herikanda civakê ji qadan re êdî ji hemû cîhanê re dibêjin; tu kes nikare îradeya me bişkîne û me ji Rêber Apo qut bikin. Herwiha Rêber Apo parçeyek ji me ye û bi me re jiyan dike, dibe ku di milê fîzîkî de ne bi me re be, lê di rastiya xwe de di milê hest, hizrandin û rastiya xwe naskirina me de bi me re ye. Mesajên gel jî ev bûn, gelek aliyan digotin ku Rêber Apo nasnameye, berxwedane û rûmete, bi dirûşmeyên wisa dayîkan hestên xwe didan xuyanîkirin û dayîkên şehîdan digotin ku em şehadeta zarokên xwe li Rêber Apo pîroz dikin. Bi vî awayî tê xuyanîkirin ku kes nikare roja me tarî bike, bi vîna gel û berxwedaniya Rêber Apo wê tekez azadî misoger bibe.

**-Piştî Newrozê û şûnde ji bo vê pêngavê wê çi were kirin û çi di pêşiya komîteyê de heye ku pêwîste were kirin?**

Pêngava me wê berdewam be heya ku em azadiya fîzîkî ya Rêber Apo bidest bixin. Ji ber ku em wek insiyatîf nabînin ku Rêber Apo ne azade, yê ku ne azad em in. Rêber Apo di girtîgeheke piçûk deye û em jî di girtîgiheke mezin de ne, dijmin lîstokên mezin li ser me dimeşîne û şerê birakujiyê û olan pêş dixe. Herwiha kampaniya imzeyan jî dest pê kiriye, armanca me ew bû ku 3 mîlyon imzeyan kom bikin lê heta niha zêdetirî 3 milyonî gihiştiye û wê berdewam bibe heya 4’ê Nîsanê. Bi rêya imzeyan gel dixwaze tekez bike ku kes nikare me ji Rêber Apo qutbike û em bê Rêber Apo nikarin jiyan bikin, mînak; gava di hundirê komînan de em digerin ji bo imzeyan, gel dikeve nîqaşan û dibêjin ji bo Rêber Apo imzeyek hindike. Di heman demê de jinên pêkhateyên ereb têkoşînekî bê hempa ji bo Rêber Apo dixwazin bikin, heyanî di milê imzeyan de jî rêjeya kurdan û erban hema bû wek hev, di heman demê de divê pêngavê de Suryan, Aşûr, Kildan, Tirkmanan, gelê Siwêda, Laziqî û Şamê jî cihê xwe girtin. Kampaniya imzeyan ji asta herêma Bakur û Rojhilatê Sûrî derket, bû li ser asta Sûrî bi giştî û ev hemleyê wê encameke baş bigre. Hêvîdarim cihê ku wê ev imze jê re werin şandin, bi erkê xwe rabin û berpirsiyatiya xwe li hember vê civaka ku xwesteka wê azadiya Rêber Apo. Di heman demê de xwestekên wê li gor zagonên cîhanê ku mafê hêviyê li ser Rêber Apo were pêkanîn û tecrîd were şikandin û bikaribe malbata xwe bibîne û ji nû ve dadgeheke navnetewî were çêkirin. Herwiha li kêlek vê pêngavê wek insiyatîv nameyek hatiye hazirkirin, ew name bi zimanê ingilîzî hatiye nivîsandin û wê ji 12 rêxistinên bingehîn re were şandin. Piştî ku serjimarî ji bo imzeyan were çêkirin û name bê şandin, pêwîste ku di rojbûna Rêber Apo de tekoşîneke mezintir were kirin di nava yekîtiyan de û em ê hewil bidin di nava wan de rêxistinan bidin çêkirin. Divê hemû alî bi erkê xwe rabin ji komînê bigre heta bighêje asta herêma Bakur û Rojhilatê Sûrî û xwedî li Rêber Apo derkevin. Bi taybet wek jin divê em nasnameya xwe biparêzin ji ber yê ku hiştiye ku hebûna jin hebe Rêber Apo ye. Em ê guftûgoyên bi vî rengî bidin meşandin, di heman demê de jî pêngava xwendina her pênc pareznameyên Rêber Apo û bi taybet ya 5’emîn wê berdewam be, da ku her kes di nav fikirê Rêber Apo de zindî jiyan bike, bi vî awayî wê mîtîng, çalakî, panêl li dar bikevin.

**-Qonaxa duyem çawa birêve diçe, heta ku kar û xebatên vê pêngavê encam bigre pêwîste çi were kirin?**

Piştî meşa li Kolin qonaxa duyem dest pê kir, di heman demê de mirov dikare di vî alî de binirxîne. 4’ê Nîsanê û 1’ê Gulanê jî li pêşiya me ye, bi taybet ev çalakî wê çawa bin û pêwîste çawa were meşandin. Ji bo pêngavê îsal hat diyarkirin ku çiqasî herikandin çêbû, di heman demê de jî dirûşmeya 8’ê Adarê jî ji bo tecrîdê cihê xwe girt û bi hezaran jin di qadan de şahiya 8’ê Adarê li Rêber Apo pîroz dikirin. Di heman demê de di destpêka Newrozê de me nirxandinên xwe nîşandan û civakê jî cihê xwe têde girtin, niha jî ji bo Rêber Apo imze û name tên amade kirin, ev yek rêvebirinek di milê insiyatîfa gel bi xwe de tê kirin. Insiyatîfa gelêrî bi xwe vî karî dide meşandin. Encama ku ev çalakî wê bigre wê bandorekî li tevahî cîhanê hebe. Ji ber ku hest û hizrên ku Rêber Apo bi civakê re parvekiriye, civakeke birêxistinkirî daye avakirin. Divê 4’ê Nîsanê jî bi rih û heyecana 8’ê Adarê û Newrozê 4’ê Nîsanê jî were pîroz kirin û bibe roja bilind kirina têkoşîn, berxwedê û qehremantiya civakê.